**K. T.**

**ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ**
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**TEZA LÎSANSA BILIND**

# EŞQ LI CEM NALÎ

**Keywan Hesan Kareem**

**WAN - 2017**

**K. T.**
**ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ**
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ**

**TEZA LÎSANSA BILIND**

# EŞQ LI CEM NALÎ

**Amadekar**
**Keywan Hesan Kareem**

**Şêwirmend**
**Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ**

**WAN - 2017**

**T.C**
**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVESİTESİ**
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**YÜKSEK LISANS TEZI**

# NALİ' YE GÖRE AŞK

**HAZIRLAYAN**
**Kaiwan Hassan Kareem**

**DANIŞMAN**
**Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ**

**VAN - 2017**

**T.C.**
**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**
**Yaşayan Diller Enstitüsü**

## TEZ KABUL TUTANAĞI

## YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

**Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ** danışmanlığında, Kaiwan Hassan Kareem KAREEM tarafından hazırlanan **"Işq Li Cem Nalî"** adlı bu çalışma, **21/08/2017** tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

| | | |
|---|---|---|
| **Başkan(Danışman)** | : Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ | İmza: ………………… |
| **ÜYE** | : Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ | İmza: ………………… |
| **ÜYE** | : Yrd. Doç. Dr. İbrahim SÜRÜCÜ | İmza: ………………… |
| **ÜYE** | : ……………………… | İmza: ………………….. |
| **ÜYE** | : ……………………… | İmza: ………………….. |

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylarım.

22../08/2017
Prof. Dr. Murat DEMİREL
**Enstitü Müdürü**

## NAVEROK


**NAVEROK** ... i
KURTE ... ii
ÖZET ... iii
ABSTRACT ... iv
SPASÎ ... v
PÊŞGOTİN ... vi
DESTPÊK ... 1
NALÎ ... 1
**1 TEORIYA EŞQA ÎRFANÎ** ... 2
1.1 Eşqa Îrfanî ... 2
1.2 Hinek Ji Têgîn Û Têrmên Îrfanî ... 16
1.3 Razên Veşartî Di Wêjeya Îrfanî De ... 29
**2 NLÎ Û EŞQA MIROV** ... 37
2.1 Nalî û Zayindyê Beramber ... 37
2.1.1 Nalî û Hebîbe ... 37
2.1.2 Nalî û Mestûre ... 49
2.2 Nalî Û Hevzayendî(Homosexual) ... 57
3 EŞQA NALÎ ... 63
ENCAM ... 68
ÇAVKANÎ ... 69

# KURTE

Bi nerîna min, ew jina di helbestên klasîkî de tê naskirin, qet ne ew jine ye, ya ku niha em dibînin, anku ne heman jine ya ku ji beriya zewac ê, an jî piştî zewacê em pê re dijîn. Ew jine ne ev jine ye. Ew jina ku di helbesta klasîk de tê naskirin, jineke razparêze ji bo mêr. Wek çawa hemû tiştên wê demê du taybetmendî hebûn, yek jê ew bû, ku aliyê nedîtbar gelek pirtir bû ji aliyê dîtbar. A din jî ew bû, ku wate û armancên nedîtbar gelek pitir û mezintir bûn ji wate û wezîfeyên dîtbar. Bi nerîn mi û gelek kesên ku lêkolîn li ser helbestên gelên din kirîn, ew jin ne ev jin e. Wek çawa hemû tiştên wê çaxê bi raz bûn, ew jina ku di helbesta klasîkî jî de hatî behskirin afirandiyeke bi raz e, ne jineke ji rêzê ye.

# ÖZET

Kalasik şiirlerde de açıklandığı gibi yaratılmış gizli bir varlık olarak düşünülen kadın sıradan bir kadın değildir. Bu nedenle normal bir insan statüsünde görülmemektedir. Dolayısıyla bu kadında normal şartlardaki doğal ve insani özellikler dışındatüm canlılardan daha üstün meziyetlere sahip lord ve kraliçe seviyesinde bir kadın olarak şair tarafından düşünülüp ona göre tasarlanmıştır. Oysaki normal şartlardaki kadın beyinin emrinde ve hizmetinde bulunan şartlar ne olursa olsun insani vasıfların ötesine çekilmeyen biri olarak düşünülür. Burada ise özel bir kadın ve şartlardan bahsedilmektedir.

## ABSTRACT

As explained in Kalasic poems, a woman who is thought to be a secret being created is not an ordinary woman. For this reason, it is not seen as a normal human condition. Therefore, this woman is designed and designed by the poet as a woman at the level of the lord and the queen, who have superior virtues superior to those of living creatures other than the normal natural and human characteristics. However, under normal conditions the female is considered to be one who does not pull beyond human qualities whatever the conditions are at the disposal of her brain. Here, a special woman and conditions are mentioned.

## SPASÎ

Ez pir spasiyan mamosteyên hêja û rêzdar ên beşê zimanê kurdî li Zanîngeha Yüzüncü Yılê dikim ku bi ked û dilsoziyeke herî mezin bi me re westiyan. Her wiha ez pir sipasiya Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZdikim ku erkê serpereştîkirina vê lêkolînê li stûyê xwe girt. Her wisa vê xebatê pêşkêşî ruhê bavê xwe, diya xwe û hemû malbata xwe dikim û her wisa ji bo gelek heval û dostên xwe bi rûmet ji bakûr û başûrê kurdistanê dikim, gelek alîkarê bi min kirin.

Kaiwan Hasan Kareem KAREEM

21. 08. 2017

**PÊŞGOTİN**

Matryaleke Dûr û dirêj e. Lêkolîneke akademîk li ser helbestên Nalî dike. Rexnegiran rexne li ser tekstên helbesta Nalî nivîsandine, lê heya niha bi awayekî reha, tu kes negihaye wê encam ê, ka ev tekstên helbestên Nalî xezel in, an jî helbestên îrfanî ne, bi tenê hinek lêkolînvan gihane vê encam ê, ew jî hijmara wan ji tiliyên destan derbas nabe.

Xebitîna min di vê mijarê de, ji bo wê sedemê vedigere, ka gelo helbestên Nalî helbestên îrfanî, an jî xezel in! Ez giham wê encam ê, ku tekstên helbestên Nalî ne helbestên ji rêzê ne û aliyên nediyar ji aliyên diyar pirtir in. Ji ber vê yekê manîfestoyek di helbestên Nalî de he ye, ji bo ku hînî gel bike, ku aşiq bin, lê ne eşqeke mecazî û bereda yî! Belku aşiqê tiştan bibin, ji bo ku desthilata berfireh eşkere û eyan bibe, da ku pitir fermanên Xwedayê mezin pêk bînin! Bi wateyeke din, heqîqeta her tişteke ku heyranbûn li dûv re ye, piştî hingê aşiq bibe! Anku Nalî pêşniyara civakê dike, ji bo ku were ser rewşa xwe ya xwezayî. Ji ber hinedê eşqa Nalî eşqeke heqîqî ye û tewzîfkirin û pesindana jinan, ne ev jine ya ku em dibînin, belku Nalî jin bi awayekî tecrîdî bi kar anî ye. (Tecrîd ) anku afirandina kesek din, di xuyetiya xwe, yan kesekê/e manevî de, ji bo ku gel bizane afirandina Xwedê çiqasî bedew e. Ji bo zêdetir zelalkirina mijara lêkolîna xwe, min qezenceke mezin ji van pirtûk û çavkaniyan wergirtî ye ( Dill û Çav , Heqîqet û Şerîet û Terîqet ), lewra min bi giring zanî balê bikişînim ser.

**DESTPÊK**

**NALÎ**

nalî, navê wî xdir (xzir) e, kurê Ehmedê Şaweysê Alî Begê Mkayelî ye. Li gund, (Xak û Xol) yê Deşta Şarezûrê ji dayika xwe bû ye. Li gorî çanda xwendinê ya wê dem ê, di serî de Qurana pîroz û hinek kinepirtûkên farsî xwendî ye. Paşê dest bi feqyetiyê kiriye û ji bo hînbûna zanistên olî, li gund, bajarok û dibistanên beşeke Kurditsanê geriya ye. Nalî heya asta dawiyê ya wê xwendinê çûye û bawernameya melatiyê wergirtî ye. Ew cihên ku Nalî heyameke dirêj lê jiyayî ev in: (Sine, Sablax, Qeredax Zerdîaway Qeredax, Helebce û Silêmanî). Nallî li Qeredaxê li cem (Şêx Mihemedê Kurê Xeyat) xwendî ye. Her li Tekyeya Qeredaxê matematîk li cem ( Şêx Mela Elî) xwandiye û il Silêmaniyê jî li Mizgefta Mezin (Hesen Seyid) li cem (Mela Ubeydulayê Reş) ma ye. Nalî piraniya dema xwe, li dîwan û tekyeya (Mewlana Xalid) li bajêr Silêmaniyê derbas kirî ye. Herwisa li Helebce û Silêmaniyê jî li cem (Şêx Ewlay Xerepanî) xwendî ye. Derbra jiyê Nalî, gelek nerînên cuda he ne. Xwedê jê razî (Mihemed Emîn Zekî Beg) dibêje: Nallî di navbera salên () de çûye ser dilovaniya xwe û di salên 1800 -1856P.Z de jiya ye. Herwisa (Dr. Merûf Xeznedar) jî heman dîrok diyar kirî ye. Dîsa jî (Dr. Kemal Fuad) jî heman nerîn heye. Mamosta ( Elaeddîn Sucadî) dbêje: Nalî li sala 1797'ê hatiye dinyayê û li sala 1855'ê jî mirî ye. Cudahiya nerîna ku li jor bal li ser hatî kişandin, derbara sala jidayikbûn û mirina Nalî, nerîna mamoste Sucadî ji aliyekî û ya Dr. Xeznedar û Dr. Kemal Fuad ji aliyekî din ve, heman hemberkirine a ku Kurdî û Merîwanî, piştî wan jî mamosta Elî Muqbîle, di sala 1215'ê KO, beramber 1797'ê P.Z encamp da yî. Heker ev nerîn û hevberkarî dirist be, her weke Kurdî, Merîwanî, Mûqbîlî û Sucadî dibêjn: Nalî nzîkî 58 salan jiya ye.

Lê di rojnameyên oryantalîstê ermenî yê bi navê (Wesf Ebgare Eec Orbêlî), ku sala 1215'ê KO, beramber 1800 – 1801P.Z hatoye hevberkirin. Anku li gorî vê yekê her weke Dr. Marûf Xeznedar û Dr. Kemal Fuad li balk kişandine ser, xuya dibe ku sala jidayikbûna Nalî dibe 1800'ê P.Z û jiyê wî jî dibe 56 sal.

# 1 TEORIYA EŞQA ÎRFANÎ

## 1.1 Eşqa Îrfanî

Eşq: Pêpîvê mirovbûna mirov e. Ev navenda îrfana îslametiyê ye.[1]

Eşq ewmala nedîtbara rihê ye, ku ne bi tenê çavên mirov biloq dike û rehetiyê ji bo laş nahêle, belku agir bi bajarê dil î dixe! Li gel vê yekê, tev hêza dahênanê jî diteqe û ew hêz ewqasî veşartî ye, ku bi hêza bêsinor ya eşqê nebe, qet dernakeve.

Eşq diça nava bedena mirov de, ew beden û can dibin beden û canek din!.[2]

Eşq bi xwe mijareke serbixwe ye, li cem her kesekî/ê were dîtin, ew kes aşiq e.

Eşq mezinbûna can e, lewra ew can bi xwe ye. Can dirist dibe, wek çawa civak dirist dibe, bi tenê ewe ku tê dîtin. WIB Li Têatroya ewe kudhêtedîtin.[3]

Eşq tevlî zanist û saziyên zanistî jî dibe, wê demê saziyên zanistî dibin laş û eşq jî canê wî laşî ye. Wê demê hemû hêz û enerjî diteqin.[4]

Bi nerîna hinek rewşenbîran, evîn û viyan ji cem Xwedê ji mirovan re hatî ye. Hemû benî bê evîn, weke laşekî biyanî ne. Herkesê/a dilê wî/ê ji evînê vala be û bê evîn be, tu carî ew kes nikare bêhna evîna esmanan seh bike.

Eşq, ewe dema hîs bi sir û seqemê di hundirê xwe de dike û ji ber xwestekên wî, canê wî hêdî hêdî dimire, derdikeve, herwisa hişk û req dibe. Weke agirek pirî pêt canê wî dişewitîne û ji nû ve diafirîne û çêdike, ber çavên wî ron dike û asoya jiyanî wî zelal dike. Mehwî dibêje

Îşq agirêke berbûwe herkes debê bêkes

Ger rojereş wek şew bê, bû be şewçirax

Elên le dewêsêkyan pirsî: îşq çiye?

---

[1] Tehsîn Hemexrîb ,Pêxembernasî ,Çapa Yekê, sala 2010, ru129

[2] H,Ç, R.127

[3] Selman Nadir , Îşq Lenêwan Fetway Fîqî Û Simbulî Îrfanîda, Kovar J.13, R.119

[4] H,Ç,R.122

Utî: agrie, wityan: meger bînîwte wa ezanî?

Utî: nexêr têyda sutawm

Ev agir, agirê umêdewarî û bextewariyê ye, ew ê ber çavên te ronî bike, eger roj weke şevê, mêriyeke pir reş û çavmezin be, bi reşatiyê hatibe nixumandin û tarî bûbe, wê demê ev eşq ê vê tarîtî û nedîtinê ronî û zelal bike.

Dema berçavên wî/ê ronî bibe, hundir, wî/ê jî ê ronî bibe.Îca dê liv û tevger destpê dike. Destipêken, heya ku digihîje eşqeke rast û dirist.Dawiyê jî têrbûn ji bo vê eşqê tune, belku piraniya mirovan bibawerin ku, dema aşiq û meşûq nêzî hevdu dibin, pêtên agirê evînê zêdetir û zortir dibin. . [5]

Eşq weke matryaleke kêmawî ye, tev perçe û organên laşê mirov ji nû ve zindî dike û wê axa reş dike zêr! Tehlîtî û jehra mar dike weke şekir! Bi rastî koka mexseda min ewe dema tê gotin: "dema ez tiştekê derbara eşq û evîniyê dibêjim, anku ew eşq ji hest û bîrûbaweran hatî ye. Anku eşq ne tiştekî xweber û bêarmanc e, lewra eşq bandoreke pir mezin dike.[6]

Eşq bi xwe mijareke serxbixweye, li cem her keseî/ê were dîtin, ew eşq e. Îca ew kes kî dibe, bila bibe! Her weke çawa dadperwerî li cem her keskî/e he be, ew kes dadperwer e, îca ew kes kî be û alîgirê kîjan grup û baweriyê be.[7]

Eşq ew tişte ku ne di bin kontrola mirovan de ye, belku Xweday, mezin vê tiştê bi her kesî/ê dide, anku eşq ne mijareke karkêfî ye û nakeve jêr kontrola mirovan de.

Eşq ne tişteke ku bi ser canê mirv de were, belku eşq can bi xwe ye.

Can komeke hêz û enerjiyan e, ku xweber serhilnadin. Belku pêdiviye meşûqek he be, ji bo ku di rêya wê meşûqê re, ew hemû çavkanî biteqin. [8]

[5] Qane Xurşîd , Îşq Wek Çemkê Bo Jiyan , Çapa dûyem, Çpêsiva Sala Çapê 2010,R.9

[6] Dr.Ebdilkrîm Sruş , Îşq Derencamî Merîfeye,û/ Şkar Omer ,Kovar Hejan j21 , R.66

[7] Tehsîn Hemexerîb, Îşq Û Dîn Û Umêd, Saytî Hejan.Kovar hejan J.13, R.41

[8]Tehsîn Hemexerîb, Dil Û Çaw , Çapa Duyem , Navenda Roşnibîrî, 2011 , R.15

Eşq rewişt, sinc û moral e, ber bi kamilbûnê gavan diavêje. Anku eşq rêxweşkirineke ji bo bedewtî û kamilbûn ê.

Ji vir û pê de, pêdiviye em behsa du teoriyên ku nirxandinê ji bo lojîk û eqil dikin, bikin. Ji bo ku em bikarin bi rêya wan teoriyan, du awayên xwendin û şirovekirinê ji bo mijara "can" bikin:

Teoriya yekem: Ev coreyê xwendin ê, lojîk(eqil) weke gewherekî sekinî û pêdiviya wê bi mezinbûn û diristbûnê tune..

Teoriya duyem: Ev teorî wisa eqil dinirxîne, ku hebûneke diristbûna wê temam nebû ye, belku pêdiviye zemîneya diristbûnê ji bo were amadekirin. Anku eqil potansyeleke hertim di diristbûn û mezinbûnê de ye.

Li gorî van du nerînên cuda li ser lojîk ê, em digihîjin du encamên ji hev cuda derbara can:

1- Heker can gewherekî sekinî û neliv be, anku her weke di vê hedîsê de tê: " melek di çil rojan de, bi fermana Xwedê can têxin laşê savayê di zikê dayika xwe de." Heker ji wê demê û vir ve, weke gewherekî sekinî li can binerin, ev tê wateya ku pêdiviya can bi xizmetkirin û mezinbûnê tune.

2- An jî, wisa lê binerin ku can ne gewherekî kamil û diristbûyî ye, belku pêdiviye şert û mercên taybet ji bo kamilbûna wî werin amadekirin. Her weke Mewlewî dibêje:"dil weke henasekişanekê ye, can weke zarokekî sava ye." Anku pêdiviya wî perwerdekirinê he ye. Ev şirove li gel felsefeya îrfanê zêdetir hev digirin, lewra îrfan zemîneyeke guncav ji bo perwerdekirina can diafirîne.

Eşq weke tişta herî nadir û giranbiha di cîhanê de tê nirxandin. Bi awayekî ku tişta herî bibiha jî di dinyayê de, nikare ji bihayê eşqê re bibe hevkûf û pêşbaz, nexwe tişta herîbaş ewe ku, em xwe radestî meşûqa rasteqîn bikin! Hertim eşqê wateyeke xwe ya esmanî he ye, lê li ser erdê jî peyda dibe.

Ji ber ku gelek caran tiştên ku li ser erdê ne, wateyeke xwe ya esmanî he ne, lê divê mirov li gor pîvanên aqil li wan tiştan binere. Pêdiviye ev yek ketin be, neku xweêxistin! Lewra eşq ketine û ne bi vîna mirv e. Ji ber ku eşq nakeve jêr vîn û

kontrola mirov, nikare bi hêsanî xwe jê qurtal bike. Ji ber vê sedem ê, bi zanîn û zanebûnê biryar li ser eşqê naê dayin, heker kesek bi xwe bigihîje vîna xwe![9]

Xweşî û tama eşqê, weke bedewî û tabloya bajarekê ye, ku tu si şeveke tarî de û li ser bilindahiyekê lê binerî, ka çawa ew çawa ew hemû fîger weke çirayeke geş tên dîtin û şewq jê diçe! Anku Mewlana dibêje eha di wî baarî de, heta niah em di kolanekê re derbas nebûne ku eşq tê de tune be! Nexêr qet xweşikiya eşqê bi dawî nabe û dibe bajerekî ji wî mezintir be, lê gerek tu cîhana eşqê tam bikî, paşê dê bigihîjî wê derê û her kesê ew derd bi serî hatibe, derdekî pir xweş e, êdî negengaze ew kes ji wî derdî poşman bibe, madem ku wî/ê ew derd test kirî ye, êdî poşmanbûna wî/ê pir bi zehmet dikeve.[10]

Nivîskarê navdarê îranî, Ebdilkerîm Sirûş dibêje: ( eşq derbasbûne ji xwesenteralizm ê, ji bo sentraleke din). Anku eşq di zaravê îrfanyan de ji bilî navend û naverasta xwe de be û di navend û naverasta canê mrov de, bi rêrewastekê din be, tu carî mrov bi tenê nabe.[11]

Kant dibêje: ( bi nerîna min, qet cudahî di navbera ol û eşq de nîn e).[12]

Eşq gelek xem û kovanan ji mrov dûr dike, bi tenê yek xem dimîne ew jî razîkirina meşûqa aşiq e.[13]

Eşq aramiyê dide mrov û mirovê aşiq kesekê/e rehet û aram e.[14]

Eşq mrov serixweş dike, bi xwe ve mijûl dikeû hest bi xweşikiyê dike. Bi awayekî wiha, ku ji hemû nêzîkbûyin û asoyên lojîkî derdixe! Ev jî wê çendê nagehîne, ku bi ramana ne lojîkî bigehîne, bi vî şêwazî ku(lojîk+eşq) wate lojîk û tiştên din jî.

---

[9]H,Ç,R. 183

[10]H,Ç,R. 199 – 204

[11]Tehsîn Heme Xerîb , Rohnasî , Çapa Duyem , Nawendî Roşnibîr , 2010 , R.109 – 110

[12]H,Ç ,R.306

[13]H,Ç ,R.310

[14]H,Ç ,R.372

Eqlaniyeta hişk rêjeyî ye, ji ber hindê gerek testkirin û azmûnên me bi şêwazeke wisa bin, ku (lojîkî) zêdetir be, anku hem eqil û hem eşq.

Mewlana dibê: (can hevl e, herkesê/a ku hevalên wî/ê gelek bin, canê wî jî mezintir e.) Heker eql bi tenê parçeyeke biçûk be , li wê demê eşq ê wê parçeya biçûk bibe û bixe di nava deryayeke mezin de û bi can binixumîne û cardin sax bike.

Hafiz dbêje: (bêhişî û mestiyê bikere û xwe ji lojîk dûr bixwe)... Çima?

Çinku eql bi tenê hişk e, her weke Şêx Seidî dibêje: ( ho eşqê, were min bi xwe re bibe, heker tu min nebî, eql ê min bixwe!)

Di vê çaxê de, kiryara mekanîkî û teknelojyayê ya îro, wexte me me bikuje, ewqasî em mijûl kirin? Lê ve nayê wê wateyê, ku ev teknelojya û amûrên mekanîkî ji koka xwe xirab in, nexêr, belku pirsgirêk ew e, ku eqş li gel tu ne.

Ev eşqe hemû kêmasî û pirsgirêkên me çare ser dike, ew navendurrasteyya ku em tev di wê hişaktiyê de asê bûne, Mewlana dibêje:(êdî ew ê bibe têkilbûna me li gel deryayê û ew ê bibe ew gemiya ku me rizgar dike![15]

Eşq yeke ji wan hestên xwedî bandor, ku hemû mirov tevî cudahiya hizr, raman û zayendeya xwe, rast tên. Bi wateyeke din, her mirovek di heyamek ji heyamên jiyana xwe de aşiq bû ye û ne merc e, ew aşq şopeke wisa mezin û bi bandor li ser hest û kesatiya wî/ê diyar bike û heta kêlîkên dawî yên jiyana xwe di wê rewşê, an ser û berî de bimîne. Lê hinek aşiq jî he ne, heta dawî qonaxa jiyana xwe, bi nemrî dmînin. Heta piştî mirna wî/ê jî ew eşq namire, ji ber hindê em nikarin têgeh û pênaseyeke ron û aşker ji bo eşqê diyar bikin û li ser biçîn, belku bigre corên têkiliyên di navbera du aşiqan de, ku corê wê eşqê were diyarkrin ,lê tevî vê yekê jî, ne merce tev coran nizîkî û hevgirtin bi wateya aşiqbûnê re hebe, hinek ol û ayin bi taybet ayin ê .[16]

---

[15]Tehsîn Heme Xerîb: Dli Û Çaw , Çapa Duyeê , Nawendî Roşnibîrî, 2011, R.22

[16]Serwer Kerîm , Îşq Lenêwan Wehm Û Waqî' Da, Çapa Duyem, Çapxaney Akam, 2006 ,R.87 – 88

Eşq tevlî cîhana (teswif)ê dibe û di hebûn û rastiya wê cîhanê de der dikeve xwe rasdestî evîdnar(emşûq)eke nediyar nake, lê eşqa zalal û diyar ew e, ya di navbera(nêr û mê)yan de. Bi hezaran efsane, çîrok û destanên dîrokî derbarey eşq û encamên eşqê hatine qeytkirin. Gelo eşqê çend namdor li ser hest û derûnê mrovî he ye, heta bi wî awayî mirov xwe ji bo bişikêne û bigre heta wê astê ku ber bi peristnê ve bibe![17]

Eşq xwedî xuyiya nemiriyê ye, aşiq û meşûq bi wê baweriya mezin û rastgo digihîjin hev. Di heman demê de, aşiq û meşûq amade ne ku, laş û bedena xwe bikin qurbanî, ji bo ku canê nemire û tim zindî bimîne.[18]

(Eşq)ê du rê he ne, yek zansit û zanîn e, ku tevlî metafîzîkê û hunera îslamê jî dibe. Rêya din jî, rewişt û sinc e. Bi wateyeke din, mirov di dema rewiş û sinc de, pêdivî bi du tiştên sereke ye:

Ya yekê: Xwejibîrkirin û piştghavêtin, anku destberdan ji hemû tiştên ku mirov heyin. Anku merd be li hember windakirina wan tiştên ku jê hez dike, heya ku qonaxê mirin ê, ku ê bibe sedema xweduyirkrin û jibîrkirina wan hemû têkiliyên xwe. Ev yek jî nîvê îrfanê ye, li cem hemû arifan, dema ku tevdigerin.

Ya duwê: (Eşq)ê ê vê mirinê bi tam bike û vê eşqê jî herweke ji beriya niha me gotî, du alî he ne:

1.Aliyê Rewşit û Sinc: Her weke Mewlana dibêje: herkesekê/e pir bû ji eşq ê, êdî rewişt û sincên wî hêdî hêdî mukum dibin.

2.Aliyê Merîfî û Zanînê: Ev zansit û zanîn, bi tenê ji ne zanyariyeke wisa hişk e, belku zanîneke weke neynikê ye, ku neyniyeke din tê de be.[19]

Weke mecazeke bidawîbûn tê de tê dîtin, lê tê temaşekirin. Aeku bi tenê zanyarî (melûme)yek be û hew li cem te he be! Belku rêyeke mrov digihîne tişteke baştir, ku hemû xasyetên hunera îslamê ji vî aliyê zansit û merîfeya eşqê tê dîtin. Belê bi vî

---

[17]H,Ç, R.89

[18]H,Ç,R. l92

[19]Tehsîn Heme Xerîb , Heqîqet Û Şerîet Û Terîqet , Çapî Yekem, Nawendî Roşnibîrî 2009, R.529 – 530.

awayî kurtkirna eşqê bi tenê di nav hest û binhişan de, weke wê yekê ye, ku di serdema nû de bikuje!

Eşq tê naskirin, herwisa ev kurtkirin jî, bi komeke yasayên rewşitî, weke pîşeya **kantî** yê hişk, cardin dubare kuştina dûriya tam û xweşiya eşqê ye, ku ew bingeha sereke ya eşqê ye û xasyet û bingeheke sereke ya tam û xoşiyê pê re ye, çunku hêz, şiyan û cireta veşartiya mirov, yên Mewelwî li gel vê yekê diteqin bi arasteya vê rêk ê.

Ev zansit û merîfe jî, ku eşqê dide mirov, zanîneke wiha ye, hertişta şerm ber-paradoksî- û wan hemû tiştan bi hev ve girê dide û kom dike, tehlî, şirînî, xem, xweşî, û... hwd. Herwisa Mewlana dibêje:

Îl Îfle danim mî kişî yek dim bebanim mî kişî

Pîş çiraxim mî kişî tada şûd çeşman min

Eşqa mecazî dikare ku wêneyek be, l, tevaya eşqa cîhanê raxe ber çavan û dibe ku rêya herînêzîke be li pêş me, ji bo gihiştina wê cîhan ê, lê bi mercekê ku me di zeviyê de asê neke! Anku me di nava axê de nebe xwar, surrealism – tiştên di nav hirz, bîr û xeyalan de- Heker xwest ku biçe dinyaya aliyê din ê realeteya dîtin ê. Lê (Seyd Hesen Nesir) gotina wî bi xwe bû, ku ketibû di bin realeteya dîtinê û jê gere hindê ku wî dixwest blind bibe, berûvajî nizim dibû. Herwisa( love )a,ewrupa jî ne ku kurt bûye di eşqa erotîk de, nelku eşqeke ke tealî bide mirov, eşqeke wiha ye, ku me germ dike, axivtin û tevgera me dike şekir û û xeyalan dûr dike. Herwisa (Mewlana) dibêje:

Ger sixin xwahî ke guyî çon şekir

Sebir kun az hersê we în selwa mexûr

Sixin nazik gişt canim az letafet hay îşiq

Dil nixwahim can nixwahim an ker an min[20]

Eşqa mecazî di serî de meşq û rahênaneke ji bo razîbûn û ragirtna li ser giranî û zehmetiyên îşqeke rast û dirist, (Mewlana dibêje: hêj zaroke û şûrê darî dide destan û heya mezin dibe şûrê (zulfîqar )ê bide. Herweke(Hafiz) dibêje:

Çu aşiq min şudem guftem kê berdim gewher meqsûd

Nedanistem kêîn derya çê mucê xûn feşan dared

Herwisa dibêjin, ku eşqa mecazî amûrek e, ji bo fêmkirinê di zimanê arifan de, çinku xasyet û bingehên eşqa rast û dirist û wêneyê wê di eşqa mecazî de he ye.[21]

Eşqa mecazî, ne bi tenê amûreke ji bo rastî yê ,belku rastî bi xwe ye. Ebediyet li wir amade ye. Herweke çawa bajar di şaristanyeta îslamî de dibn wêneyek, ji bo diyarkrin û nîşandana hunera îslamê û bajarên can(gyan) ava dibin ( ku di kongreyeke Yoniskoyê de, di encamê wî navî de, bi bajarên can(gyan) hatin binavkirin) jberhindê Lewra bajarê fezîlet ( El-medînet El-fadîle ) bajareke arîf bi xwe can(gyan)ê xwe tê de dibîne, ne weku ku bajarekî bi xem, xeyal û aşopî be, ku di nav hizr û bîrên fîlosofan de weke îro jê re tê gotin. Weke mizgeftekê, şemilkek ê, anjî muzîk û sitranekê di hunera îslamî de dibin wêneyek jbo nîşandana wan rastyên îrfaniyên kûr û dirêj. Wisa eşqa mecazî jî bi heman awa û form, wêneyeke ji bo rengvedana ewê rastî yê.[22]

Li cem xelkê îrfan, eşq du cor e: eşqa mecazî û eşqa heqîqî…

[20]H,Ç, R. 530

[21]H,Ç, R.534 – 535.

[22]H,Ç ,R.537 -538

Eşqa mecazî, viyan û hezkirina mirov ji bo mirov( jin ji bo mêr ,zarok ji bo daybabên xwe û hezkirina heval ji bo hevalî/ê).

Eşqa heqîqî, anku rastî jî viyan û hezkirina mirov ji bo Xwedê... Hezkiirna xweşiya jiyanê ye. Herweku ewên dijîn ,weke hebeke tixûm e, di seî de ê biteqeû şapeyan ji xwe bide û paşê ê werarê bike û mezin bibe.Anku zivirîna dema wê temam dibe.[23]

Astên Viyan Û Hezkirinê:

*Dîtin û geryan ji bo wê hezikrin û viyana ku di nav hundirê mrov de hebûn, he be.

* Di meyzekirinê de, mirov di nav hemû kesan de ê bibe kesek bi tenê bala mirov bikişîne.

*Û heyranbûn jî mirov ber bi rehetî û aramiyê dibe .

* Hemû balikişandinek jî heyranbûn di dûv de tê.

* Rehetîû aramî dibe hezkirin (hub) .

* Û hezkirin jî dibe eşq.

* Eşq jî tê guhertinn ji bo serxweşî û hayjixwenebûnê (sergerdanî)

* Serxweşî jî tê guhertin ji bo fenabûn û jinafçûn ê.

Piştî fenabûn û jinafçûnê, hezkirina mecazî bi dawî tê û qonaxeke nû ya hejzkirinê serhildide. Ku hezkirina rastiye û mirovî ji bo hezkirina xwedayî vediguheze. Weke dilopeke avê ya nerm û mest di nav deryayeke bê sinor de.[24]

[23]Elî , Nalî Her lelutkedaye , Dezgay Çap Û Pexşî Serdem Silîmanî, 2009, R. 231-232

[24]H,Ç, R.232.

Li vi rem dikarin bêjin, ku ji bo ku mirov ji hezkirina xwedayî fêm bike, pêdivî bi azmûna hejzkirinê he ye, bi taybetî azmûna hezkirina mecazî û dilxweşbûn bi afirandiyên Xwedayê dilovan. Bi watayeke din, ji bo serwextbûn û naskirina Xwedayê mezin, pêdiviye mirov sewdayeke aşiqane bi afirandiyan re praktîk bike, heya rêya serwextbûna afrandyên berhest û aliyê mîtafîzîkî yê wan tiştan ji bo wî kişf bibe, da ku zêdetir li rêya vê sewdayê li kiryarê bi soz û dilovanî nêzîk bibe. Anku ji ku mirov wan tev tiştên li ser rûyê erdê hebûn heye nas bike, baş jê fêm bikeû şehrezabibe, pêdivya mirov bi encamdana azmûnên hezkirinê û aşiqbunê he ye, bi wan tiştên di vê gerdonê de hatine afirinadin, herîtaybet encamdana azmûnên eşqê ye li hember afirindaiyên xwedayî yên herîbedew.

Ew yek jî derûn û hundirê mirov bi xwe ye. Lewra ew tiştên afirandî yên di cîhanê de heyin, bidin nsskirin û em hest bi hebûna tevaya wan tiştan dikin û li be dest û laşê me dikevin. anku em pitir ji her afirandiyekî/e din hest bi hebûna van hemû tiştên ku di cîhana me de hebûn jê re hebît .

Eşq birçiya can û derûne û ew tris, lerz, nearamî û hovtiya wê birçîtiyê bi bihênkirin û himbêza laşe û bedena hevdu, agriê wê divemire û rehet dibe. Ji ber hindê her ij destpêkê helbesta viyan û hezkirinê bi bayekê tûj û dijwar yê himbêzkirinê re, ku rih û rîşalên wê derdixe û ev herdu kesên han di encama destêvedan û himbêzkirina hevdu, navê wan di ferhenga aşiqanda tê jêbirin. [25]

Eşq dîntî ye, ji blî perîşanî, wêranbûn, jinafçûn, poşmanî, xembarîû dudilya( fêmkirin) û (têramîn nîne), lê hezkirin û viyan di pile û bilindkirina mîracê de û ew di sinorê lojîk, hest û sozan de diçîne û têgehiştin û têramînê jî li ser rûyê erdê nahêle û bilind dike û bi xwe re ji bo asta herîbilind ya rewşenbîriyê ( îşraqî ) dibe.[26]

---

[25] H,Ç, R.233 – 234

[26] Ramanêk Leçemkekan , Û/Mhimd Baxewan, Çapxaney Genc , 2010,r, 113

Eşq û hertişa ku dil bixwaze, di meşûqê de diçîne û hezkirin xweşikî, dilxazî, hesit, nest û hertiştê di meîşûqê de( hezkirin ) dibîne û amade dike.[27]

Eşq şaştiyeke mezin û bi hêz e. Hezkirin rastiyeke dirist ya can bi can (tije dil), ya bê dawîû reha ye. Eşq di nav deryayê de niqum bûye û hezkirin jî di nav deryayê de avjeniyan dike.

Eşq dîtinê ji mirov destine. Hezkirin dîtinê dide mirov.Eşq bi kerb û kîne û di heman medê bê hurmet û bê bawerî ye. Hezkirin nazik û nerme û di heman demê de bi hurmet bi bawerî ye û cihê piştrastiyê ye.

Eşq hemû deman bi gumanê dorpêçkirî ye. Hezkirin ji destpêkê rastgoyî û bawerya temame û gumanê na nake. Heta ku em zêdeter ji eşqê noş dikin, têrtir dibin, heta ku pitir ji hezkirinê noş dikin, şeydatir û nûtir dibin.Eşq hindî bime, kevntir dibe, lê hezkirin nûtir dibe. Eşq hêz û şiyaneke di aşiq de, ku ber bi meşûqê ve tê rakişandin. Hezkirin rakişana aşiq û meşûqane, ji dost û hevalan. Di (hezkirinê de), ku heval ber bi heval dibe, eşq xwdiya meşûqê ye, hezkirin jî têhna hêz û şyanan e, di meşûq de.[28]

Eşq xapandin û şaştiyeke mezin û pirî hêz û şiyan e. Heya ku mirov bi jiyanê ve mijûyl bibe û bi tiştên rojane ve – ku piranî xweza jê hez dike – sermest bibe û hezkirin zîrekiya tirsêye ji xerîbî û dûyirketinê û derûn(zat), hay ji tirsa mirovî he ye, di bazarên biyanî û nexweş û di demên bi tenê û hayjixwenebûnê de .

Eşq gerryane li pey xweşî, tam û lezet ê, hezkirin jî geryane li pey alîkarî(hawarçûn) ê. Eşq nanxwarineke pêşçav, berteng û çilêz e, lê hezkrin(vedîtina yek ziman û hevbeşiyê ye, di welatê biyanî û xerîbiyê de ).[29]

Eşq core gurrînek e, ji naverast û bûna Xwedê, ber bi meşûq ê! Yekemîn tişta ku pêdiviye aşiq tê re derbas bibe, ji bo gehiştina meşuqa xwe, viyan û xweşiya derûnê wan e. (( Mewlana)) dibêje:

Îşqhay kiz pî ringî bûn Îşiq nebûd aqbit ningî bûd[30]

---

[27]H,Ç, R.114.

[28]H, Ç, R. 114

[29]H, Ç, R. 114 – 115

Wate:

Ew aşiqên ku bi dûv rengekê ve bin, wan tama eşqê nekiriye û dawiya wan şerimzarî ye. Eşq hêvî û viyaneke ji bo bidestxistina başiyê di hemû deman de.

Eşq bi berdewamî tekoşîneke ji bo cudabûn ê.

Eşq ji nava rihê wê yekê diyar dibe, ku qencî jê were, bi neçarî di eşqê de ye, di ser hindê re ku(Xwedê) ye jî.[31]

Felsefeya eşqa lastandal girêdanbûna wê ye, ji bo eşqê ku di çar taypan de tê dîtin, eşqa di navbera jin û mêran de.

Eşq hewa û hemaset e. Eşqa atifî, eşqa bê biha , eşqa fîzîkî. Eşq weke sedem, weke manfestekê camêrî, dibe sedema zêdekrin û dubarekirina fezîleta rewşitî, ewan fezîleta ku girdayî camêriyê ne.[32]

Eşq romanek e, geryanek e, li dûv mijareke nû û nêyêzanîn de. babetekê ne temamî hezê ye, da ku zêdetir jê nêz bibin, ji hev bigrin û netemamiya xwe nîşan dide.[33]

Eşq dibe sedema camêrîkirnê hem ji aşiq û hem meşuq.

Eşq bidestxistina rûhî ye, ku nekare weke seks lê were temaşekirin.

Eşq hemaseke ku yekbûnê diafrîne.

---

[30]H, Ç, R. 115

[31]Faruq Refîq , Hunerî Eşq , Çapî Yekem, Çapxaney Serdem, Silêmanî 2010, R. 111

[32]H, Ç, R. 189

[33]H, Ç, R. l21

Eşqkirin, an jî viyan, bidestxistina tamê ji dîtîn ê. Destlêxistin, hestkirineke pir ji nêz ve ye, bi rêya hemû hesteweran, bi destxistina tamê ye ji meşûq ê, kesek ku em jê hez dikin.

Ev pênasa herîsadeye eşq ê, bi tenê wê yekê ji me re dibêje, ku eşq hemase û helbet li destpêkê divê eşqeke fîzîkî be.[34]

Eşq bihayekî nû diafirîne, bihayek ku negengaze wateya wê ji bo bihayekî babetî were guhertin, ku dibe mijara wê eşqê he be. Ku em dikarin navê wê bikin(bexşîna biha).[35]

Eşq meyleke bi şiyarbû yî, ku matryalan li gorî pêdiviyên xwe hildibijê.

Eşq mijara xwe naafirîne, belku bi awayekî afirandinî dibe bersiva mijara eşq ê.

Eşq di ser hemû tiştan re ye, ew tişte, ku rê de bî, anku ew tiştê ku karekê dike tiştekê din û tişteke din bibe, hebûn he be.[36]

Bi nerîna Hegel, eşq weke têkoşînek ji bo tecawizkirina mirnê tê dîtin. Herwisa mirinê wiha, weku wê wehiya manîfêsta eşqa mutleq be, wêne dike.

Eşq geryaneke li pey kamilbûnek ê, ku ji bûna bilindtir temaşa dike. bê ev xeyalkirina kamilbûnê û bê hebûna xeyalê weke fakultiyek, tişteke bi navê eşqê nabe. Xeyal weku fakultiyek, tenê wênê îdîalên xwe xêz nake, belku karekî dike, ku meşûqê bi rêya wanî bibîne. Ev wezîfa dawî yê, îdîalkirina eşqê ye û hemû deman pêdivî bi îdîalkirinê he ye. Bi rêya xeyalkirinê aşiq meîşûqê dibîne. Weke bîrhatinekê û bîranîna çend îdîalekan ku xwedî eşq îfadekirinkê, li vir eşqa wî kesî derbirînê ji xwe terxankirineke durûtî dike.[37]

---

[34]H, Ç, R. 219

[35]H, Ç, R. 223

[36]H, Ç, R. 63-69

[37]H, Ç, R. 79

Eşqa heqîqî û Eqa mecazî, wIhaye ku Eşqa heqîqî û eşqa îlahî û xudayî ye, ewa din jî eşqa mirov ji bo mirov e. Lê zatê wê peyvê bi tu pêpîv û ferhengan wê wateyê napejirîne.[38]

Li vir peyva eşq û evên, bi wateyeke sade bi kar anî ye. Li gorî eşqa wan rasteqîne, an derewîne û bê bingeh e. Eşqa rasteqîne ne eşqa xwedayî ye, belku evîna kesêkê/î ji bo zayendeya beramber e, bi awayekî ku palderê evîna wî ne tiştekî matryal û jinavçunê ye, belku xwedî mrovek û rûhyetê ye, ku ew jî ne tiştekî jinavçûnê ye, na ew bingehekî evîndar wiha lê dike, ji ber yara xwe hemû tiştan û narehetiyan qebûl bike.

Eşq bi vê weteyê hestekê pir kûrûpaqij e, mirov ber asta herîjor ya camêrî û merdîtyê dibe. Di vî coreyê evînê de, hez û şehwet axiftin tuneû hisab ji bo wan nayê kirin..

Mighrî dibêje: helbestvan û wêjevanan di ser hindê re ku şehwet û hez beşeke ajelî û pesnnizm nîşan dane, ta radeyekê ku hevberkirina eql û eşqê bibaştirzanînê eşq bi tişteke bi edebyata me pêkhatî ye.[39]

Eşq corek ji cihghurtinê ye, ji navend bûna Xwedê, ber bi meşûqê ve . Yekemîn tişt ku pêdiviye eşq tê re derbas bibe, ji bo gehiştin bi meşuq ê, viyan, derûnî û nefs in.[40]

---

[38]Qan Xurşîd, Îşq Lenêwan Eqil Û Ayinda, Çapî Sêyem, Çapxaney Genc, 2010, R. 21.

[39]H, Ç, R. 21-22

[40]Fatîme Edhem , Leîşqî Mroyyewe Ta Îşqî Îrfanî, Govarî Henar, J.25, Beharî 2012, R. 141.

## 1.2 Hinek Ji Têgîn Û Têrmên Îrfanî

**BWERIYA ARIFAN BI ÇAR GEŞTAN HEYE:**

Geşta Yekem: Ji afirandiyan destpê dike, heya afrêner.

Geşta Duyem: Ji afirêner,ku arif pê re dibe heval bi nav û sîfetên Xwedê reû Xwedê jî bo xwe dixemilînin.

Di Geşta Sêyem de jib o arasteya afirandiyan vedigere.Li gorwê yekê, jib o ku ji hundirê Xwedê biqete, bi armanca rênîşandana xelkên din.

Geşta Çaremîn, geştkirine di nav xelkên din de. Lê ji Xwedê jî venaqete.

Lewra di vê quncikê de, arif hewl didin di nava xelkên din de bin û rêyan nîşanî wan bidin, bi armanca rênîşandayina wan bi aliyê Xwedê.

Meqamên Îfanê:

Meqamê Tobe : Tobe peyv û têrmeke quraniye û mexsed hêlana gunh û tevaya wan karên neşerî yên ku Xwedê qedexe kirine.

Di îrfana praktîkî de, tobe destpêka terîqetê ye û hêlana her tiştê ye, ji bilî Xwedê. Şiyarbûne ji xewa xeflet ê, rih û mercê pêdivî jî silûk e.[41]

Meqamê Werei: Xwegirtin û xweparêziye di nava terîqetê de û hêlana gumanê dûrketina ji muherematan e. Destipêka Zuhdê ye, anku devberdane ji bêziravan û nêzî wateya teqwayê ye. Hêlana axiftin û kiryarên bêbingehe û destpêkirna karên qenc û drist e.

Meqamê (Zuhd): Bi wateya devberdan ji tiştekê tê. Lê di îîfanê de bi wateya terkkirin û hêlana xweşî û nîmetên dinyayê ên helal e, herwisa heznekrin meylbrrîna ji wan e. Bi armanca paqijkirina derûn û pesendkirna rêyên heq.[42]

[41]Murteza Muteherî, Pêşekîyek Bo Îrfan, Govara Hejan, J.21, Û: Herdî Bdalle /R. 404.

[42]Ekrem Înbî, Govara Hejan, j.17_18, Îrfana Praktîkî, R.408

Zuhd ev azmûn gringiyê bi parktîkkirina wan wate û manayên zuhdê û neviyana dinyayê û xwedêpersitiyê dide. Ku di deqên Quran û hedîsan de hatî ye. Bi rêya devberdan ji xweşiyên dinya, jyan û pêşero jê, bi rêya girêdana bi xwedêperêsî yê, ji bo gehiştin bi hezkirina Xwedê û guhdarîkirineke temam ji bo fermanên Xwedê.[43]

Meqamê (Feqr): Feqr ji aliyê ziman ve, hejarî û bêdesthilatiya dinyayê ye, bi hebûna meyl û viyana dinya yê. Lê li dem îrfanan, Feqr nazandin û xwehecekirina bi Zatê Heq û naznekirin û xwehewcenekirina ji bilî wî zatî ye.[44]

Feqr : Wergirtina zanyarî û zanînê ye, bi awayekî bêserûbin.[45]

Meqamê Sebr: Meqamê Sebr li cem îrfanan, meqamê herî bizehmete û azmûna herî nerehet ya rêwiyan e, di terîqeta heqiyê de. Sebr xwegirtine di xweşî û nexweşiyan de, xwegirtine ji pêkanîna heqê meqaman. Herwisa xwegirtine li hember heq û li gel heq û ji heqiyê ji bo heqî yê.

Meqamê (Tewekul): Tewekul ji aliyê ziman ve piştgirêdane bi tiştek ê. Anku teslîmkirina tişta bi xwediyê wan. Ji aliyê îrfanê ve temam teslîmkirina kare bi Xweda, ku xwediyê rast ê hertiştê ye.[46]

Tewekul: Ev têrm jî, ji Quranê hatiye wergirtin. Mexsed, pêdiviye rêwî hemû karûbarên herdu dinyayan bide dest Xwedê û wî bi tu hilbijartinek tê de nebe.[47]

[43] Sebur Seywan, Govara Hejan, J.21, Sofîgerî ÛÎrfan, R.31

[44]Ekrem Înbî, Heman Çavkanî, R.20

[45]Tehsîn Heme Xerîb, Dîdêk Bo Dînnasiyî Niwê, Sal2009Z, R.544

[46]Ekrem Înbî, Heman Çavkaniya Berê, R.21

[47]D.Abrahîm ahmid şwan,sofîkerî,dezgehê çap xanawezareta perwerda hewlêr,çapa êkê, 2002,r.64_65

Meqamê (Fena): Fena neman û jêçûn e. Meqamê heftemîn e, di îrfanê de. Dawî sefere ji bo bal Xwedê ve.

Fena jêçûna beniye di heqiyê de. Anku jidestdana sîfeta mirovayetiyê ye û wergirtina sîfata îlahiyê ye![48]

Fena paqijbûne ji sîfetên pîs û wergirtina sîfetên bedew û paqij e.[49]

Fîraq: Qutbûn û dûrkeftina salekêye ji bo demeke kurt, di cîhana tije sirûda dahatî û şewqa gehiştina bi dîdara mehbûb ê/î. Bi rêya slûk zincîreke drêj û vekiriye ji gehiştin û dûrketin ê. Berdewamiya salekê ye, di miraca riha xwe de, girêdayî wsesl û fîraq kirî ye. Di gehiştin(wesl)ê de, can tê avêtin di deryaya dahatiyan de. ,di fîraqê jî de, xwe ji bo aliyekî dinê rihê amade dike.

Fîraq: Ew dem e, ku tu ji bo heyama salekê sîfetên bedew werdigirî. [50]

Fîraq: Devberdana salekê ye, i silûka rêya wehdanyet ê.[51]

Zulf: Semboleke ji bo firehî( kesret) yê. Ku bingeha tesewifa îslamê ye. Livandine ji piratiyê ber bi yektayî( wehdt ) ê. Ji bo vê yekê jî têrma (Zulf) bi kar hatî ye, weke sembulek. Zul (tiştên pirt û belavbûyî yên dinyayê ne) rê li roj û heyvê digire, ku derbikeve û rê nade mirov bigehe wateya tiştan ya kûr.

Xala : Piraniya helbestvanên mezin ev têrm bi kar anî ye. Weke Mewlewî dibêje:

Herçende le brêz xeyala xalen

Ce xeyala xad maçî xala xalen

[48]Ekrem îîenbî ,govara hejan.j.17_18 , îîrfanî praktîkî ,r.23

[49]Tehsîn heme xerîb,dîdêk bo dîn nasî nwê,r,526

[50] Amadekirna m.Alî /nalî her le lutkedaye ,r,223

[51]Tehsîn heme xerîb,dîdêk bo dîn nasî nwê/ r,526.

Xal : Semboleke ji bo yektayî( wehdet) yê . Dema arifek dibêje aşiqê xala yara xwe me, di rastiyê
de dibêje, aşiqê wehdanyetê me û yektayî me.[52]

Tecrîd: Smbole ji bo hêlana wan tiştên mirov bi dinyayê ve girê dide(elaiq el-dinya). Herweku( Nalî ) dibêje:

Xoşa renda le dunya bi mubalat û mucered

Be roj zîndûy cemaet ba beşew mat û mucered ba

Ebed Û Ezel: Anku dema bê sinor û bê dawî.[53]

Ebro: Ew xale, ya ku tê de wacib(Xwedê – cel celaliho ) digehîje mumkin, weku di mîracê de Pêxemberê Xwedê gehihaye astek ê, ku Quran wesfa wî bi(qabe qewsyn ew edna…). Gehiştina bi dawiya meqamê ku mirov dikare bigihîjê ye.

Birûyên Mijûl: Ew birûya ku di cihê xwe de rûniştî ye. Ev jî sembole ji bo ketina salekê di rê de.Anku hêlan di rêya silûk de.[54]

Îşaret: Anku haydarkirina salek ê, an aşiq ji aliyê meşûqê ve, bi awayek ê.

EyanênSabetê(E'yan Sabîte): Pêkhatina obektîfa tiştan ji aliyê xaliq ve.Ku pştî hingê wicûd bi wan hatiye dan û hatine nava cîhana wêneyî.

Bitxane: Anku cîhana ceberûtê(cîhana sîfat û navên Xwedê).

[52]Tehsîn Heme Xerîb, Heqîqet Û Şerîet Û Terîqet, Çapa Yekê, Nawendî Roşnibîr, 2009, R.522.

[53]H,Ç, R. 523.

[54]H,Ç, R.523

Bit: Anku tecelabûna lutfê Xweddê(cele celalilo). Ev têrm jî li cem Nalî pir hatiye bi kar anîn.

Pîrê Muxan Û Pîrê Meyxane: Anku mirovê temam. Ew pîrê ku dikae salekê têxe ser rêya silûk ê.

Tecid Û El-emsal: Nûbûna dinyayê ya berdewam. Bi têgîna Quran ê(Kulu yemw huwe fî şein).

Tirsabçe Û Mixabçe: Anku encama tecelaya Yezdan.

Telwîn: Renggirtina mirovê ku salekê di her meqamekê de, di rêya silûkê de diçe. Di her meqamekê de, borek ji edebê jê re dirist dibe, heya digehe asta edebê ya dawî û cihgir dibe.Jê re dibêjin(Temkîn).[55]

Wicd Û Mewacîd: Xweşiyeke di dema silûkê de, ji bo salekê pêş têt, bi taybetî ji bo yên di destpêka rêyan de. Weku Mewlewî ji hevalê xwe re dibêje wî derdî tuşî wî girt.[56]

Cam: Dilê sofî ye.

Cam Cîhan Nima: Dilê mrovê kamil e. (Di îslamê de, anku Pêxemberê Xwedê) ku hemû cîhan tê de civiya ye. Bi nerîna hinek arifan, hemû bûn û wicûd dubare di dilê Pêxemberê Xwedê de(s.x)

Erka xwe pêk tîne.

Fidq: Wergiritna zanyariyan û zanîna tiştan bi awayekî berbelav.

---

[55]H, Ç, R. 523

[56]H, Ç, R. 523

Cemi: Destkeftina yekîtiyekê ye, di navbera wateya tiştên nehatîn zanîn, bi rêya ihsan, îrfan û wanewiye tê.

Çav(Çeşm ): Anku bînayê ezelî.[57]

Xerabat: Anku  şerabxane. Di têgîna îrfanê de, anku ne cî, k utu ciyek weke wî tu ne! Weke têgîna(nakca: bad ) li cem(Nîzamî Gincûy).

Dli: Defîneya nepeniyên îlahî ye.

Xawgir: brîtî ye juy tiştî ku cin yan frîşte dêxîte dlê mrovî, eger li frîşteve serukanî girtbît ew îlhame , eger li cinve (dehba ) vejî bû ew wî demî wesweseye.

Dem: brîtî ye li  ( srrî xefî ) ku jlayê  ( mehuy ) gelek hatye bkarînan.

Dîwanegî: brîtî ye ji  zalbûna ehkamî ya iîşqê bi ser mruvê salekê da.

Rmiz: derkeftna nhênî ya îlahîye.

Xawgir: Tişta ku cin, an melek dixin dilê mirov. Heker çavkaniya wî tiştî ji melekan be, ewîlham e. Heker ji cinan be, wê demê ew weswese ye.

Dem: Razên veşartî ne, ku li cem Nalî pir bi kar hatî ye.

Dîwanegî: Zalbûna ehkamên eşqê ye, bi ser mirovê salekê de.

Remz: Derketina razên îlahî ye.

Rend: Guhdarîkirina fermanên laş û derûnê mirov û gehiştin bi aliyê rûhî ye.

Rû: Rûyê heqîqetê ye.

Zenexdar: Lutfa qehirdar e.[58]

---

[57]H, Ç, R. 524

Zenar: Gelek helbestvanên kevn ev têrm bi kar anî ye, ku sembole ji bo xwegirêdana bi  yektapersityê ve(weitesemû bi helblî Allahî cemîen).

Saq: Berjewendî û hikmeta îlahî ye.

Sebi Teraiq: Ji Quranê hatiye wergirtin, mexsed heft perde ye:

Perdeya Eql

Perdeya Ilm

Perdeya  Qelb

Perdeya Nefs

Perdeya Hestan

Perdeya Îrade

Perdeya Meşîet[59]

Sitir Û Tecelî: Xweveşartin û derketin ji bo ehlê taybet, hertim tecelabûn he ye, divê salekê hewl bide ji (sitir)êbigehe(tecela) yê.

Sîne: Sîfetê ilmê îlahî ye. Weku têrma singa safî bi kar hatî ye.[60]

Şahid: Tiştek,an kesek e, bi rêya wî xweşikiya îlahî keşf dibe. Êdî dikare mirovek be, dikare jî tiştek din be, wek: ilm, helbesteka xweşik ya îrfanî, an jî perçe muzîkeke xweş.

---

[58]H, Ç, R.524

[59]H, Ç, R.524-525

[60]H, Ç, R. 525

Şeti Û Tamat: Gotinên serve serve ne, ku li cem gel ne wateya wan heye û ne jî rûdaneke wan ya mezin. Weke wan tiştên ku di dema bêhişyê de ji devê arifan derdikevin.

Saf Û Dirûd: Ji bo meyê tê bi kar anîn, ku înayet û îtaba Xwedê ye. Saf anku hezkirina Xwedê, dirûd jî mîhnet e.[61]

Shû Û Skir: (Sehû) anku bihişhatina salek ê, piştî ku mala îrfanî girtî. (Skir) bêhişbûn e. Ev jî ne xweber tê, belku piştî haleteke îrfanê yê mezin bi ser de hatî qewimî ye, weku dîtin, hestpêkirin, heybet û cîlweya bedew bi meşûq ê.

Sîfatî Cemalî: Ew sîfet û navên Yezdan in, yên ku girdayî rehmeta Xwedê ne.[62]

Xîret: Kerbvebûn û bêzarbûn ji şirîk î. Xîreta aşiqe ji bo meşûqa wî .

Fîraq: Dûriya ji yar ê. Hêlana salekê ya silûk û rêya wehdanyet tê.

Leb: Lêv.

Fena El-nûr: Helyan ji ronî yê.[63]

Nalî yekcarç bi kar anî ye.[64]

Xilîç : Gunehên mezin.

Xifîç: Rasthatina li gunehên siviktir.

Fena: Paqijbûne ji sîfetên nebaş û wergirtna sîfatê paqij, bedew û baş e.

Beqa: Ew deme ku salekê sîfetên xweşik werdigire.

---

[61]H, Ê, R. 525.

[62]H, Ç, R. 525

[63]Dîwana Nalî , A.Mela Îebdullay Hewarî Neseb, Bilawkirawey Kurdistan, Îran- Sine, 1387, Çapa Şeşem, R.305.

[64]Tehsîn Heme Xrîb, Rohnasî, Çapa Duyem, Nawendî Roşnibî, 2010, R. 180

Kufr: Têrma kufr li cem arifan,anku xerqbûn di nav firehiya dinyayê û wêney de.[65]

Peyva kufr + pêşgir şev, yek carê li cem Nail hatiye bi kar anîn.[66]

Şewq: Di îrfanê de, şeydabûn, hez û lepitîna dil e, jib o gehiştina bi mebûd.

Xelwet: Quncikgirtina sofyatiyê ye, ku heyamekê di quncikê de dimîne û naçe ji derve.[67]

Mihadire: Anku amadebûna dil e, ji ber pirbûna birhan û belgeyan.Herwisa ji nazikiyên sibehê ye. (Mehura) anku nehiştina edetan, ku (Mehwî) ji wir tê.

Îsbat: Tesbîtkirina ehkamên peristin ê.

Zuleyn: Meqama ku her tiştek bikeve ber çavên arif, yekser Xwedê tê de dibînr. (Keenehû yera Allah). Dîtineke zewqê û şuhdê ye..

Zuleqil: Di vê astê de, mirovê ku salekê piştî dîtina mexlûqatan, Xwedê tê bîra wî. Astekê ji(Zuleyn)ê jêrtir e.

Mest: Anku ehlê cezb û sekir. Di vir de salek heye li gel meczûb ê.[68]

Salîk: Ew kese yê/a ku ji serî destpê dike û yek bi yek meqaman derbas dike, ku piraniya xelkê bi vî awayî ye. Bi nerîna min, Quran jî pitir bal dikişîne ser vê rê, ku hewl daye bi rêya exlaq rêbertiya mirovan bike. Heta kêlî bi kêlî bilind bibin ji bo meqamên bilind. Bi derbirîna Quranê ji (Eshab el-yemîn)ê bigihîjine(El-sabîqûn).[69]

---

[65]Tehsîn Heme Xerîb, Heqîqet Û Şerîet Û Terîqet, R. 526

[66]çnînî deq, D.Avan Alî mîrza , çapxana ney , slêmanî , 2012 , r, 281

[67]Deqê Dîwana Nalî, A.Îetaella Hewarî, Çapa Yekê, Bilawkirawey Kurdistan 1391, R. 264.

[68]Tehsîn Heme Xerîb, Heqîqet Û Şerîet Û Terîqet, Çapa Yekê, Navenda Roşinbîrî, 2009, R.526.

[69]H, Ç, R. 526

Nehcar peyva mest, li gel paşgirê li cem Nalî hatiye bi kar anîn. (mestî xeyalat), (mest û bîmar), (mestî xerabat), (mestî zeqûm ), (mestî şerabî taze), ( mestî munacat ), (mestî xew), (mestî xeyalî ew). Yekcarê peyva(mijey mestî) hatî ye.[70]

Meczûb: Ew kesên ji destpêkê tên. Tiştên wan hemû nezalal in.

Mişahide: Dîwarê şihûdê ye, ku tu gumanekê li cem mrov namîne. (Mihazire) piştî vê meqamê destpê dike û piştî vê jî(Mikaşife) rûdide, ku nemana perdê ye, êdî di vê meqamê de mirov diçe di nava matmayinê de.

Mey: Zewqeke bi sedema bîranîna meşûqa rasteqîne, di nava dilê arifan de pêk tê, ku êdî mest û medhûş dike.

Meyifroş: Li pîra wî kesê ku rênîşandayina salekê dike.

Naqûs: Têramîna di dinyayê de ye. Niqumbûne di cîhana firehiyê de, ku berûvajî wehdanyetê ye.

Nefes(dem): Nazikiyên bîranîna nava dil e. Anku ew salîkeyê xwediyê nefsê ye. Bi dîqettir ji xwediyê dil. Çinku rewşeke gelek derbas e, ku bi ser salîk de tê.[71]

Nefs: Wicûda tiştekê ku ji xweşikî û paqijiyê be. Ku bi vê sedem ê, rewişt, tevger û axiftina salîkê benî xweşik dibin.Heker ji nebedewtiyê jî be, dîsa jî pêdiviye we nefse were mudahidekirin. Anku nefs tişteke, dibe hilgira xesletên xweşik û yên nexweşik jî be.Bi gotina mamoste Nasirê Subxanî, nefs rûheke ku têkil bi xesletên xwezayî bûye. Ji ber hindê nefs ji çend beşan pêk hatî ye:

Yekem: nefsa(El-emaretu bî el-suî): Nefsî ku hertim fermanê li xwediyê xwe dike û dixe jêr kontrola xwe.

Duyem: nefsa(Ellewame): Hertim gazinan ji xwediyê xwe dike, da ku fermanên Xwedê pêk bîne.

Sêyem: nefsa(El-mutmeîne): Nefsa ku gihaye rehetiyê û hevrikî tê de nema yî.

[70]Çinînî Deq Le Şîrekanî Nalîda, D.Avan Elî Mîrza, Çapxana Kemal, 2012 , R.373

[71]Tehsîn Heme Xerîb, Heqîqet Û Şerîet Û Terîqet, Çapa Yekem, Navenda Roşinibîr, 2009, R.527

Warîdat: Bîranîn(xewatir)ên pejirandî ne, bi rêya melekan diçin nava dilê salîke.[72]

Wicdan: Rewşek e, piştî devberdana ji piraniyê(muxareqe) û tevlîbûna nava yektayî yê, bi ser dil de tê.Cemei meqameke ku êdî tiştên salîk giringiyê pê dide yekalî dibin.

Wefa: Înayeta ezelî ye, mirov ji şer diparêze.

Waqie: Haletên ku rastî salîk tên, di dema zikr de bi tenêtî.

Weqt: Qutbûna mirove ji borî û pêşeroj ê, di niha de dijî. Ku tu ji ber çavên min winda dibî.An(Nalî ) dibêje:

Damim le heçeda seferî be ...... Le weginda

Xurbetkeş û aciz be ...... Eger ehlî xerîqî

Heft Bajarên Eşqê: Anku heft bajarên işq ê. (Wadî) yekeya silûk e, li şûna îradê weke bingehek ji çarçovê bingehên sereke yên irfan ê). Ku arifê mezin(Ferîdedîn Etar) gotî ye: (Tilb, eşq, merîfet û istîfa tewhîd, mirwet û fena

).[73]

Hişyarî: Hevaltiya berdewam ya salîki ye, li gel komeke sîfetên derekî û hundirî, ku jê re dirist bûne, ji ber zalbûna eşq ê.

Heybet Û Onis: Meqameke di ser(Qebs Û Beset) re. Heker(xof û rica) ji bo kesekî ku ji nû li destpêka rê da ye ji bo nava silûkê de. Nexwe(Qebs Û Biset) ji bo salîkekê ye, ku meqama derbas kirî ye.Anku(Xof) dibe(Qebs) û (Rica) jî dibe (Besit). Li piştî derbaskirina(Qebs Û Biset) ê, îca meqama Heybet Û Onis destpê dike.

Yar: Sîfetên îlahiye li gel hemû hebûnan de. Bi tu pêpîvek ê, tu têrmek bi qasî vê têrmê wateya têkiliya di navbera salîk û meşûq de bi têrî û zelalî nade. Çinkî ev kurteiya tewhîdê ye, ku desthilat û înayeta xwedê di hemû afirandiyan de dibîne.[74]

[72]H, Ç, R. 527-528.

[73]H, Ç, R. 528 – 529

Heşt caran peyva yar bi paşgir û peyvên din de li cem Nalî hatiye bi kar anînweku( yara min, yara xar,  yara seng û dil, yara bê wefa û yar û diyar).[75]

Her di çerxa duwê ya mişextî de, mey di helbesta sofîgeriyê de bû sembol û nîşaneke îrfanî û çendîn peyv û têrmên girêdayî  meyê û haleta mestbûnê di helbesta sofîgeryê de bi kar hatî ye. Sofiyan heman ew peyv û têrm bi kar anîne, yên ku di meygusarî(elximiryat) bi kar hatin e. Ev corê helbestan di demên Emewî û Ebasiyan de werar kir. Lê sofiyan rewşa mestbûna wan bi(hal û meqamat)ên sofîzmê ve girêdabûn.

Helbestvanên sofiyan behsa mey, mestî û serxweşbûna wan kirî ne, dibe ku teim jî nekiribin! Hafizê Şîrazî, ku  di wesfa şerab û mestiyê de, tu kesan destê wî negirtî ye, dibe ku tuxma şerabê neketibe. Anku dibe helbestvanên sofî hebin, ku qet xwe nêzî şerabê û jinan nebûbin! Lê helbestên pir baş di vê derbarê de gotine. Demê dil û rewanê kesên sofî ji viyana Xwedê pir dibin, wisa hest dikin, ku gelek nêzî Xwedê bû ne, anku digehe asta herîjor ya hezkirina Xwedê. Wê demê bi temamî dihele. Êdî qet hest bi xwe nake û di nava zatê Xwedê de winda dibe. Di wê demê de sofî diçe nava rewş û haletê mestbûn ê, sofya ew halet mestbûna xwe bi sembol û peyvên cor bi cor derbirîne, wek:(nehîbe we el-hidûr, el-sihûr we el-sekir, el-zewq we el-sekir). Herwisa helbestvanên sofî, di çerxê duwê yê mişextî de, di helbestên xwe de behsa(mey, şerab û cam )an kirin e.[76]

Mestbûn: Mestbûn bi eşqa xwedayî, bêhaybûne ji tevaya tiştên dervey meşûq ê. Dibe mestbûn bi corekê din şeydabûn be. Demê aşiq mebesta eşqa mehbûbê dibin, êdî têkiliya wan ji tev tiştên din qut dibe û bi tenê guhê wan yarê dibihîse û zimanê wan jî bi tenê yarê dibêje û.. Her mestbûne wisa bi sofyan dike, di dema

[74]H, Ç, R. 529.

[75]Çinînî Deq Le Şîrekanî Nalîda, D.Avan Elî Mîrza, Çapa Yekê, Çapxana Kemal, 2012, R.385-386.

[76]Mhimd Silêmanî Îbas, Mey Û Mestî Le Şîrî Sofîgerîda, Govarî Raman, j.177, R.16

darkarîkirina wan de, hest bi tu êşanekê nekin. Mestî pirbûne ji dîlan ê, semaya dewrêşkî li pey xwe tîne.[77]

Cewher: Anku (jenetîk, koka û madeya tiştan). An(bûneke sekinî û xweber)

Ferd: (Kit, tenê, bêwêne, bê hevkûf).

Cewherê Ferd: (Gewhereke, ne bi kar û ne bi hêz, nayê perçekirin.)[78]

Sembola vê tu ne, matryala sefera cîhaneke dn e. Ew sefer jî bê soz û dilovanî Xwedê pêk na yê. Derbara wê şerabê Ibn Faris dibêje: "ji beriya ku sembol he be, ew hebû ye, di meha çardeşevî de dizivire û roj digire. Ew şerab roniye neku agir, cane neku laş, her kesê/a bi wê şeraba evîna xudayî mest ne be, bi dîtina tîrêja bedewiya Xwedê şad na be!

Li cem helbestvanên sofiyan: Mey sembola hezkirina xwedayî ye. Saqî: Rêber, Meynoş: salîk. Pîrê Meyvexwer.

Meyvexwer: Qutb û cam tîrêjavêjê cîlweya xwabî. Mitrib: Hişyarker. Stiran jî: Pileya pîroziyê ye.[79]

Meyxane: Pitir bi wateya dilê aşiq bi kar tê. Bşeke sofiyên mezin, pitir wê yekê teqez dikin, ku mirov dikare hundirê sofiyên profesyonel(ne sofiyê normal), bi (meyxane) bi nav bike.

Dil: Li cem sofiyê mezin yên îslam ê, çavkanî û xezîneya razên Xwdê ye.

Meded: Di irfanê de, ew alîkariya manewî ye, ku mirîd ji kesên ji xwe bilindtir, bi taybet murşidê xwe werdigir. Ev meded jî di dema pêdiviyên manewî de tê daxwazkirin.[80]

[77]H, Ç, R.50

[78]H, Ç, R.52

[79]Mhimd Silêmanî Îbas, Heman Çavkaniya Berê, R.52

[80]M.Elî, Nalî Her Lelutkedaye, Dezgay Çap Û Pexşî Mehwî, 2009, Silêmlinî, R.170 – 220

Saqî: Meyê dide sofiyan û li cem wan hevwate û di asta şêx û rêberan de ye, ku bi destê salîk û murîdan digre, ber bi hezretê mezin û balê dibe.

Mey, ew emestbûna hudirî ye, ku tu cudahiyek bi mestbûna şorşgerêkê di dema rûbrûbûna zordaran de tu ne. Ji ber hindê mey û şerab weke şewq, ronî û hewarhatina derûnî, geşbûneke pirî tîrêjên şoreşgeriyê jî ye, ku newekheviyan rast dike. Şerab îmaje ji bo şoreşa derûnî û eqlî. Mey dihelbesta sofîgerî de, sembola eşq û evîna xwedayî ye, çinku ev eşq alîkar û sedemek e, ji bo gehiştina bi haletê(el-wicûd), mestbûn, windabûn û qutbûn li keynûnet ê. Û her bi rêya ve îmajê ye, sofî behsa gehiştina roniya nefsê dike.[81]

## 1.3 Razên Veşartî Di Wêjeya Îrfanî De

[81]Muhemed Silêmanî Îbas, Mey Û Mestî Le Şîrî Sofîgerîda, Govara Raman, J.177, R.85

Eşq di helbesta klasîk ya kurdî de, li ser sinorên eşqeke tesewifî û zihnî xwe ava dibe. Ev rewş di wêjeya ewropî jî de tê dîtin. Bi taybet li serdema şorişa Îtalya û Frensa de. Îdîayên esmanî ji aliyê Dantî û Petrark ve, hatin nava wêjeya îtalî. Li Frensayê jî, grupa Dûlaplayad di vê hêlê de insiyatîf bû, bi taybet Dublê û Pyar Runsar.

Eşqa me mijareke gerdonî ye, tevlî helbestê dibe. Dibe ku helbest û eşq di koka xwe de heman tişt bin! Hinek caran eşqa jinekê bi dawî bûye û bûye eşqa xwedayî! Hinek caran jî bi matryalên eşqa dinyayî, derbirîn ji eşqa xwedayî hatie kirin.[82]

Ji bo ku biçin nava vê mijar ê, ku em dixwazin ev navenda mijarên îro, ji bo doh vegerînin. Doh min behsa cudahiya ji beriya modernîzm ê, bi dinyaya îro re kir, ku gelek ji biryaran wisa yeqîn dikin, an bêjin kilîta vekirina wê dinyayê bi wan re ye, mînak: (Maks Vîber), di wê bawerê de ye, ku heker kilîtek hebe dinyaya berê pê were şirovekirin, ew jî(raz, nepenî) ne. Qaşo tiştên wê demê hemû evsaneyî ne, ev jî bi nerîna min li gel perspektîfa arifên cîhana îslamî de digunce. Anku heker Maks Vîber wisa yeq'n dike, ew dinyaye dinyayeke raz bi raz e, efsane tê de ye, bêguman li cem îrfanên Rojhilat û Cîhana Îslamî, mijarên nepenî û efsaneyî di nava hemû tiştên vê bûnê de, her ji Xwedê bigre, heya afirandiyan, he ye. Maks Vîber baş lê nerî ye, ku raz kilîta nîşandana wê dinyayê ye. Heker em bixwazin senetr û klîteke me he be, ji bo ku wê dinyayê pê şirove bikin, ew jî raz e.[83]

Raz, mufredeyeke ji dinyaya tesewifê digihîje cem me. Wateyeke psîkolojîk he ye, lêgerîneke veşartî ye, li jêr xaneyên mirov, bi taybet dil. Ehlê dil xwe ji ehlê zahidan cuda dike:

Yekem: Dinyaya hest û binhişan.

Duwem: Dinyaya eql.

---

[82]Dr. Rhimd Salar, Evîn Û Îrfan Û Edebyata Kurdî, Sayta Hejan, Govar Koç, J.177, R.77

[83]Tehsîn Hme Xerîb, Dil Û Çav, R.197_ 198

Ji bo wê hinek caran zehmete tu bi yekê rewşa a din şirove bikî, lewra(sembol) îmaj û wêneyên cor bi cor tên bi kar anîn. Helbestên klasîk tam bi dinyaya tesewifê re hemdem in, çunku dinyaya tesewifê xwedî xwezîneyeke pir giringe û helbestvanên klasîk berdewam xwendine û jê bibandor bûne, heta hunerên tesewifê jî ji bo evîna dinyayê bi kar anîne. (Reqîbê civakî û nebûna azadî yê.[84]

Wêjeya me çavkaniyeke olî ye, lewra hemû çavkaniyên zanyariyan ji olê, yan ji pîroziyan tên. Helbestvn di nava vê etmosferê de çavên xwe vedike, weke beşeke têkildar li van hemû diravan tê temaşekirin. Dîroka helbesta fikrî ya kurdî, dîroka wêjeyî ye, ne dîrokeke din, wêje jî helbest e, anku helbest vê dîrokê pêk tîne. Zemîn ji bo têramîna rût amade nabe, ku matryala vê têramînê pexşan e. Ji ber hindê mirov hest bi werareke fikirî, di nava vê dîroka helbestkî de, nake.

Helbest bi matryalên wê yênriwanbêjî wek: sembol, metafor, wêne û... hwd tê nivîsandin. Van hemû huneran, komeke wateyan he ye, bi gotineke din, pitir ji şirovekirinekê hildigirin. Jiber hindê sinorên helbestên îrfanî û provat dikin zur ruya ,ji vê qonaxê da tîkelîk yek bin.[85]

Helbestvanên klasîk, weke senetkarên wê dem ê, li ser ziman xebitîne. Yekî weke Nalî, ne bi awayekî xweber helbest nivîsandî ye, belku weke hesinkarekî li ser mufredên wê xebitî ye. Dax kirî ye, kutaye û cardin neqişandî ye.[86]

Anku aliyên nedîtbar yên tiştên serdema berê, gelek ji aliyê dîtbar pitir in...

Herwisa hikmet û wezîfeya nedîtbar ya hertiştek ê, gelek zêdetire ji wezîfeyên wan yên ku tên dîtin. Ji ber hindê, dema ku hikmet û aliyê nedîtbar mezin dibe, mirovan jî hewla keşfkirina wan razan da ye. Hem keşfkirina aliyê dîtbar û hem jî hikmeta nedîtbar, berdewam her mirovek di çaxên berê de, li pey razan gera ye, dema ku razên razekê keşf kirî, yekser matmayî ma! Anku gava yekem keşfkirin destpê dikeç

[84]Dr. Rhimd Melaevîn Û Îrfan Û Edebyata Kurdî, Kowar Hejan, J18, R.123

[85]H, Ç, R.144.

[86]H, Ç, R. 145.

Anku ji ber ku raz he ye, tu diçî pey razê dikevî, paşê wê razê keşf dikî û qonaxa duyemîn îca destpê dike. Piştî keşfkirin ê, ji heyranbûn ê, li hember tiştê ku keşf kirî mat dimîne. Pişt mendehoşî û matmayîn wî digire, êdî ji bo meqamek din tê kişandin, ew jî meqamê (Eşq)ê ye..[87]

Bi nerîna min, ew jina di helbestên klasîkî de tê naskirin, qet ne ew jine ye, ya ku niha em dibînin, anku ne heman jine ya ku ji beriya zewac ê, an jî piştî zewacê em pê re dijîn. Ew jine ne ev jine ye. Ew jina ku di helbesta klasîk de tê naskirin, jineke razparêze ji bo mêr. Wek çawa hemû tiştên wê demê du taybetmendî hebûn, yek jê ew bû, ku aliyê nedîtbar gelek pirtir bû ji aliyê dîtbar. A din jî ew bû, ku wate û armancên nedîtbar gelek pitir û mezintir bûn ji wate û wezîfeyên dîtbar. Bi nerîn mi û gelek kesên ku lêkolîn li ser helbestên gelên din kirîn, ew jin ne ev jin e. Wek çawa hemû tiştên wê çaxê bi raz bûn, ew jina ku di helbesta klasîkî jî de hatî behskirin afirandiyeke bi raz e, ne jineke ji rêzê ye.[88]

Weke Nalî duîje:

Herçende însane leberçawî min û to

Mumkîn niye em lutfe leînsan û beserda

Heker di helbestên dildarî de, têgînên çav belek, zilf, bejn û bal qirik hest û hisa helbestvaniyê hilgirtibe, li hember yara bisk reş, rûbixal û bejn rihan, di îrfanê de ev têgîn ji bo wesfkirina cemala rûyê hezretê heq bi kar hatine.

Heker di helbesta dildarî de, sewdserî, dînbûn û biçolanketin li pey yarê ciyekî mezin girtibe, di helbestên îrfanî jî de, mestbûn, fena, meyxane û qurbanîdan xwedî rol bûne.

[87]Tihsîn Heme Xerîb, Dil Û Çav, R.196

[88]H, Ç, R.198

Zatê Heq, di menzûma îrfanî de Zatê Heq perçeyeke eşqê ye, ku nikare bi çav were dîtin.Ji bilî wê dema ku mirov weke çiyav nûr dişewitîne. Bikaranîna têrmên zimanê urfî, bi wateyeta xwe ya taybet di wêjeya îrfanî de, bi ser herdu astên hezreta meşûq û terîqeta meşûq tên parvekirin…

Ya Yekem: Pitir behsa birû, bisk, perçem û xet û xalan e.

Ya Duyem: Pitir behsa gehiştina bi meşûqê dike, weke mest, şerab, meyxane, cam, saqî û… hwd.

Di wêjeya îrfanî de, huner û teksta wêjeyî dibe deriyek ji bo tevlîbûna nava cîhaneke din, cîhaneke mezintir, lewra di tekstên îrfanî de, ne bi tenê em çav li beşek ji vê wicûdê nakin, belku em hest bi hebûna çend cîhanên din jî dikin.[89]

Zimanê arifan heman zimanê normalê nava gel ne bû, çenda ku têrmên nava vî zimanê normal bi kar anîn e. Bi taybetî di qonaxên paş de, arifên îslamî têrmên berbelavên nava gel bi kar anîne, weke: bisk, lêv, mey û… hwd.

Ev hemû têrm, weke sembol bi kar anîne(sembolbûn yek ji taybetmendiyên hunera pîroz e). Li vir jî em dikarin bêjin, zimanê arifan zimanekî taybet bû ye, cuda ji ziman, normal, ku bûye wêneyek tê de tiştên melekewtî hatine nîşandayin.

Bikaranîna têrmên urfî û normal, weke elementa beramber û xweza, ku ev tev sembolek bûn, ji bo jib o dinyayeke bilindtir; nexwe zimanê arifan zimanekî taybet bû ye. Ku paşê navê vî zimanî kirin(Mentiq El-teyir), ku ev navûnîşana bajarekê mezinê îrfanî jî ye.[90]

Ji ber hindê vê bingehê taybetmendiya xwe heye û teybtemendiya hereseker û bingehîn ên vî zimanî jîew e, ku hemû têrmên di nava vî zimanî de bi kar hatîn, semboleke metaforîk in. Ku erka wan guhestin û amadekirine ji bo dinyayeke din. Ji ber vê sedemê ye, ku beşeke taybet di zimanê arifan de bi navê(Şethiyat) pêkhatî ye.

---

[89]Selman Nadir, Evîn Û Îeşq Li Nîveka Fetwaya Fîqhî Sumbula îÎrfanî, Kovar Hazhan, J.13, R.34.

[90]Tehsîn Heme Xerîb, Dîdêk Bo Dînnasî Nwê, R.518_520

Herwisa hinek têgînên giştî jî bi kar hatine, ku hinek ji wan arifan wateyên taybetî lê bar kirine. Lewra evên han bûne neynik û sembola cîhnaeke bilindtir.

Eşq dibe ew neynika ku van arifan nîşanî me dide. Bi rastî ewên ku li şaristanyeta îslamê nerîn, ev aliyê nedîtbar nedîtine, ji ber ku ew neynik li pêş xwe nedanîne. Ji ber hindê wêneyê vê şaristanyet, weke mucahidek, tê pêş çavên wan.Rojava'yê şûrê xwe hilgirtiye û nizane seba çi şer dike.[91]

Nalî weke helebstvanekî kalsîk, behsa mijarên serdema xwe kirî ye, weke: dildarî, wesf, dua û lav, bêrîkirina welat, lorandin û pêgotina miriyan. Lê ev mexseda ku nivîskar û lêkolînvan jî balê dikişînin ser, bi xwe dibin navûnîşan ji bo wê peyama hûr û bingehîn, ya ku dixwaze ujdana dîroka gel û netewên din qeyt bike.[92]

A rast peyama Nalî ya yekem, diyarkirina erk û mafên helbestê ye û ji wê şûn de jî, bawera wî bi sihra gotarê(sihra beyan) he bû. Dema helbestvan dixwaz azmûna xwe ya helbestvaniyê bigihîne, pêdiviya wî bi awayekî cadûçîtiyê he ye, cadûkirina guhdarvan û cadûkirina xwendevan. Di encama cadûkirinê de, têkiliyeke ku mukum di nnvabera helbestvan û xwendevan de ava dibe. Dibe ku beyan taybet bi helbest û bedewiyê ne be, lewra têgîneke berbilav he ye. Lê dibe ku ew cadûya beyanê tevlî hikmeta helbestê bibe. Ji bo vê armancê jî, dilê bi hêz û darіştina baş dibin faktora bandora Nalî niyeta cadûyê beyan e. Hikmeta helbest ê, emmnayeta hêza dil û qudreta avakirinê di vê rewşê de helbest ji wê yekê bilindtire ku bi tenê ji bo derxistina rewşa derûniya helbestvan bi kar ahtibe. Helbest dibe hikmet û watebend û felsefeya jiyan ê. Anku ew goşenîga ya li bara mirov û iyanê pêk tê, ev ew helbest e.

Beyta yekem ji dîwana Nalî behs li(bedewî, husn)ê tê kirin, ku termeke objektîv û dirist e.

---

[91]H, Ç, R.521.

[92]Dr. Sebah Berzincî, Peyamî Nalî, Govarî Goç, J.18, R.172

Lê binere têgîneke xwedayen û bi itîbar e, herdu têgîn jî di rewşa mestî û bedewiyê de, dema ku dildar dibe mestê bedwiya dilbera xwe, tên dîtin. Nalî derkeftina van du têgînan bi Xwedê ve giradane.[93]

Yek ji miarên herîdiyar yên nava vî temenê helbesta Nalî, ku ferhinga helbesta wî dewlemend kirî ye, mijara kultura helbestê ye, mexsed ew hemû gotin, hevok û derbirîne ne, ku bûne beşek ji ferhinga helbesta rojhilatî bi giştî û helbesta farsî bi taybetî.

Ku xuyaye i bo Nalî çavkaniyeke dewlemend a serbest bû, bêguman hevok û têgînên herdiyar ên girêdayî vê mijar ê, ewin ,n ku w,ney,n helbestê pê hatiye avakirin.Weke wan gotin û hevokên derbara xweşikiya jinê û xweza yê. Mînak: (xemî zulf, reqîb û… hwd).[94]

Nalî weke(Ebûtemame)yê ereb, pir mijûlî van hunerên hûr û bû ye. Nalî xuyiyeke pir xweşik û safî he ye, piraniya van hûrguliyên hunerî, bê ku pir xwe pê ve mijûl bike, bi dest ketine, ku bi nerîna min, ev yek ji çend sedemên bingehîn vedigere.[95]

Nalî rasterast û nerasterast bala me dikişîne ser du miarên din, ku bi nerîna wî, weke du stûnan in, ku helbesta Nalî li ser ava dibe, ev du stûnên sereke, yek ji wan ziman û ya din jî wate ye. Ka em ji van destpê bikin, ev jî destpêkirin nayê wateya girihngînedan û piştguhavêtina ziman! Bi nerîna min, Nalî di helbestên xwe de, awayekî derbasbûna ji form, derbara gotara wêjeyî ya kurdî afirandî ye. Anku Nalî ji bo cara yekemîn gotarek di helbesta kurdî de ava kir, ku pişta xwe bi merîfe û têgehiştina mirovê kurd germ kiribe.[96]

---

[93]H, Ç, R. 274

[94]Dr. Avan Alî Mîrza Tufîq, Çnînan Deq Le Hozan Nalîda . r 177

[95]Dr.Kemal Meîîruf, Edebyatî Klasîkî Û Nwêxwazî Kurdî, Çapa Yekê, sall, 2003, R.163.14

[96]Ebdalxalq Yeiqubî, Govarî Koç, J.18 û 19, Nalî Le Nîştîmanî Meirîfewe Ta Xurbetî Ziman, R.339.

Cîhana helbesta Nalî ser rêje ji wê zemîna ziman, merîfe û raman ê, ya ku Nalî ji beriya hingê xwendî. Li ser wan bingehan helbesta xwe ava kirî ye. Mînak: Yek ji gotarên diyar yên ku helbesta Nalî li ser hatiye avakirin, gotara têramîna bi awayekî olperwerî ye, ev jî bi sedema ku Nalî bi xwe mirovekî olperwer bû, mela û olnas bû. Lewra regezê ol û amajekirina bi wan têgînan, di helbesta Nalî de pir berbiçav û zelal in.[97]

[97]H, Ç, R.339 _340

# 2 NALÎ Û EŞQA MIROV

## 2.1 Nalî û Zayindyê Beramber

### 2.1.1 Nalî û Hebîbe

Ax legelême hebîbe serû peywendî nîye

Ey şeker qedde, bela bendî heye, qendî nîye

Adetêkî heye hergîz le kesêk naprisê

Zalimêkî weye qet xewfî Xudawendî nîye

Dulberêkim heye meşhûre bebê manendî

BêşIk û şubhe, Xuda şahîde, manendî nîye

Ehlî dinyayye leber hîrs û temî wişyarn

Be xû sûsî bgerrêy mest û xîrdemendî nîye

Xaneqaş herwekû meyxane, keher awabê

Meclîsêkî heye, emma gep û gobendî nîye

Waqîen xaneqe xoş remze meyekî têdaye

Bela qendî heye, gendî heye ,rendî nîye

Medrese, mehbeseye, mehbesey wesweseye

Kesî têda heye, emma xoş û xursendî nîye

Talîbî rahî hîcazim, le muxalîf helden

Bênewa qelbî hezînim quwetî bendî nîye

Şîrekanim, kecger goşî mnin, derbedern

Dilî Nalî çî reqe, qed xemî ferzendî nîye ![98]

Helbestek e, dibe ku deriyek baş be, ji bo ku em biçin nava kûratiya vê mijar ê, da ku em taybetmendiyên helbesta Nalî raxin ber çavan. Ew helbesta ku redîfa wê(baza), anku(baz=a) biya were, anku dubare were. Li vir ev têgîna farsî, li gel derbirînên kurdî bi kar anî ye.

Rûhim rengînî rengî rûmetî rengînte,baza?

Qedî serûm kemanînî qedî şîrîne,baza

Xerîb û bêkes zara û feqîrî xanedanî to

Ciger sutaw malwêranî zulfî çîne ,baza

Meazealla ke rehmêkit be halî zare minda bêt

Ke axir bendey xakî dere pêşînte ,baza!

Eger xwênim derêjî to, ewe tîx û emîş gerdin

Eger binyadî peyman, destî min damênte, baza

Leçawanim heta key qetre qetre xwên dekey ey dost!

Kuwa em ehd û peyman û wefa kabînte, baza!

Benalî bawerit nabêt, xeyalln bêt û bîbînê

Keçon mejxulî nexmey nalînit, baza[99]

Bket: Asta hezkirina li cem Nalî encameke he ye.ku gelek dirêje ji mexsed û kiryarên wî. Heker wan ku carekê hezkirina wî ya xweşvî di nav bazara xwe dibîne, daxwazê jê dike, ku careke din serdana wê xweşviyê û hestên xwe bi kar anîban, da ku guynek bê kirin, ji bo karên mezintir û bihêztirnek ji bo peyva hezkirinê(Nalî) ew helbest ji bo Hbîbe yê nivîsî ye. Li paçeyeke din de dibêje:

[98]Dîwanî Nalî, Lêkullînewe Û Lêkdanewey Mela Ebdulkerîm Muderîs Û Fatîh Ebdulkerîm, Çap Bilawkirdinewey Kurdistan, Çapî Şeşem, Sal.1387 Hetawî, R.321

[99]Tehsîn Heme Xerîb, Dil Û Çaw, Çapa Yekê, Sal 2011, R.196_197

Xerîb û bêkes û feqîrî xanedanî tom

Ciger sutaw û malwêranî zulfî çînte baza

Li vê jiyan ê, hezkirin ew xweşikî û heste ye, ku mirov mijûl dike, çinku serwetê mirov ji nav dibe.[100]

Ew çawe xezale feneratî ser û male

Ew nergise kale nemnî hêşt û nekale

Li vir Nalî peyamekê dinşîne, ku bêzarî ûbêtaqetî vedrîna wezê sarû sir. Ew naxwaze kesek sade û canek dilşa be li vê dinya yê

Wek sofî safî mebe alûde be dunya

Bêhûde mukder meke ser çawî meşrûk

Heker kêmtirîn xwendin û berawirda peyvan bikin, bê tu şirovekirin behsê dîrketina ji berawirdikrin ji dunyayê dike, ber bi nûkirinê araste dike. Bi rastî wî zanay ji bo wê hindê gringî pêdana ramana bidin û bikare bêje heta radeyekê baş wî karî encam bide, bêdengî û bêlivandin bi raman daye heta wî radê kariye canê xwe mezin û cîhana hundir nedîtî gelek ji nav bibin wî kesî divêt ev core bibe yek ji giringtirîn rêk livandin beruvakrî eker kesek bixwaze canê berme û nazk were û peywendê li gel cîhana ramana de ava bike, divêt bi berûvajî bûna dab û nerîtên xwe bike anku biçwarçûveya dubarîy û bazneya westyanê di jyana rojane de servetir biçe ev ezmûna caniya takî û pirmana dike.[101]

---

[100]H, Ç, R.196_197

[101] Musieb Edhem, Hejan, J.25, Lewênewe Bo Mana, R.167_168

Qenaeta(Nalî) wisaye ev (Hebîbeye) ku mexlûq jineke aşiq  li cem Nalî ne mirov e. Li ser tirî mirovaye. Bi nerîna min Nalî ji wê hêzê ji hemû helbestvanên din helbestvantir bû ye. Kariye nîşan bide, ku yara wî ne weke miroveke normal e!  Wek hemû tiştên vî serdemî razdar e. Lê kariye wek(Mehwî û Mewlewî) nekeve nava ku meşûq xalq dike. Bi yek heta xelk ji yê têk biçe wê cidahiyê bike ku es mest û mexlûq e, belku mexlûqeke razadar e. Di bawera wî de pêdiviyekeku  bînînê dide çavên wî bêguman evê çendê têkilî bi fêmkirina wî nvîskarî he ye.[102]

Çavê yara wî dibe dike  Nalî têt wî beş amadebûyin  xweşviya diyarî dike, ku astî dîtinye rastî tê de parastina bihayê eşqa xwe ji bo yara xws çima têt ji parçeke biçûka laşê mirov. Anku weke rexnegrekî naxwazim nirxandina xwe bikim, lê mat mayîme çima Nalî ji bo xwe cihê nazêye can chê diyar li gel sedema çarçîwek hebe di evînê de, ji bo wê xelk behs bike. Her di wî çavî de ku diyare gotar bi wî awayî mêrsalarî, eşîrtî mijara hijmara civakî bû ye.

(Nalî) di cîhana xwe ya helbestê de, ji vê çanda mêrslariya civakê xwe dûr digire û di çavên çavan de behsa eşqê dike. Ji kêmasiyên yara xwe ber bi cîhana eşqê diçe.[103]

(Nalî) perspektîfeke berûvajî ya wê demê hebû, bi nerîna wî pêdiviye ji çavên wî bi xwe tîrêj derbikevin, ji bo ku xelk bibîne. Ji ber ku meşûqa wî di çavên wî de ye, ewe a ku dibe ew tîrêja ku xelkê din jî pê dibîne.

Şewqî nebê basîre, meuyse le dîtin

Her şewqî ewe quwetî dînî benezerda

Heker tîrêj ji çavan dernekeve, nayê dîtin, lê ya wî newisa ye.Ji meşûqa xwe re dibêje"Her ewe quwetî dîn", ku eyva "dîn" li cem Nalî, ku li her cihê bi kar anî ye, mexseda wî ne ol e, belku mexseda wî dîtin e, dibêje her ew hêza dîtina mirov e. Mexseda Nalî meşûqa wiye di çavên wî de. Heta wê Nalî xistiye rewşek, ku hertim destên wî bi xwîna kezeba wî sor bin! Hertim bi ax û fîxan be, ku qet ez wisa hzir

[102]Ebudulxaliq Yeiqûbî, Govarî Goç J.17 û 18, Nalî Lenîştîmanî Meîrîfewe Ta Xurbetî Ziman, R.370_371

[103]Tehsîn Heme Xerîb, Dil ÛÇaw, R.207 _208

nakim, ku zayendeya beramber wisa bi serê mirov bîne, îlehî heker mexlûqeke pir efsûnî be![104]

Şewq di zimanvaniyê de, meyla derûn û livîna hezê ye. Di îrfanê de, heyranbûn û tênîbûna ji bo gehiştina bi mehbûbê ye. Di vê dêrê de Nalî dibêje: şew heyranbûna yarê ye, hêza dîtinê daye çavên min. Roniya rûyê hezkiriya min e, berçavên min ron kiriye û tiştan pê dibînim… Heyranbûna arif ji bo dîtina Xwedê, hêza bawerî û olê dayî yê. Çavên dilê wî vekirine û tiştan weke lojîka wan dibîne. Şewq û heza nalî jî ji bo yara wî, dîtina tiîtan bi awayekê li cem ron kirî ye, xeta gewhera bejna yarê û gewhera ferdî ku ji beriya niha me bal kişandiye ser, dibîne.

Nalî bi hinera xwe ya hûr, herdu wateyan di vê dçra helbestê de bi hev re girê dide.Ev jî bi rêya peyva(ol) di dêra duyem de ku wateya ol dide.

Ey cîl û derdî husn û cilew kêş temaşa

Ser riştey dînî bê medey to niye haşa

Feyaçî riyaçî gul û mîhir û mil û le'lî

Ey şewqî rox û dewqî lebit zamîqe pexşe

Zewatî ukûsî keşî mîrî celalin [105]

Di van çend dêran de, ji bilî awayê sofyatiî yê hezkirina Xwedê, du aliyên din ên zelal bandora sofîzmê tên berçav, yekem bi karanîna çendîn têrmên taybet ên sofîzmê ye(cêlwe, husn, mede, feyz, şewq, zewq, mîhr û… hwd). Bi heman arasteyê di wî warî de bi kar tîne. Ya duyem berçavketina niyazmendî(ihtiyac)a berdewama beniye bi Xweda yê wî. Heta di meseleya baweranînê jî de.Ew niyazmendiya hertim benî neçar dike ku berê xwe bide deriyê(lutf)a Xwedê û di navbera tirs û lavan(xûf û

[104]H,Ç, R.207_208

[105]Amadekirdnî M. Elî, Nalî Her Le Lûtkedaye, R.219

reca) de dimîne. Tirs ji wê, ku kiryarên benî ne di asta razîbûnê de ne. Lav jî ji wêku rehmeta Xwedê di hewara wî/ê de biçe.[106]

Ew helebst bi cêlwedera husn û cêlwekêşa temaşê destpê dike, teqîna vî wêneyî ne teqîneke nomal e, ji bo ku cêlewederê husnê û cêlwekêşa temaşa, bêna erdê jê tê, ne ya esmanan. Binere li cilewkêşê nikare ayman be ji bo ku barê hest û atîfeya cilewkêş li jêr be. Çavkaniya ol jî tê ser dîtin ê, ji bo ku hersê wêneyên sereke ên vê dêrê tên ser karê dîtin ê, nexwe di vir de dîtin nikare wateya dîtinê bigihîne.[107]

Dîdem hemû şorawe beşorawî sruşkim

Lem lewhe nîgarîne ne eyn û ne eser ma

Wazenme be ruxsareyî to xaîbe qurban

Binware çilon neqse lenîw dîdey terrma

Di zimanvaniyê de gelek wateyên (eyn)ê he ne, di vir de bi wateya made tê nirxandin. Eser jî bi wateya paşmayî û eeeyê tê.Salekê di mîhraba canê xwe de ji hemû tiştan û paşmayiyên tiştan winda dibe û di nava hebûnê de namîne. Ji vê rewşê re fenabûn ji xelq(fena en el-xelq) dibêjin. Lê piştî vê fenabûna ji xelxê, (beqa) li gel Xwedê destpê dike û arif ji bilî Xwedê gişt tiştên din weke exyar temaşe dike.Di xwe de û di hundirê xwe de, derfetê hebûn bi wan nade û wî dilî girêdayî bûneke fanî nake.Belku xwe digihîne çavkaniya bûnê û di nav wateyê de bûna xwe ya heqîqî werdigire.

Di van du dêran de Nalî dibêje:

Ku ez hêsirên şor yên çavaên xwe ji bo yarê dirijînim, ji bo jêbirina çavên min û wan wêneyên ku li dinyaya derve digire, çavên min hebûna xwe nema ye, îca

[106] Ebdula Qeredaxî, Karîgerî Sofîgerî Beser Şîrî Kurdîda, Govarî Ayinde, J.790, Temûzî 2008, R.52.

[107] Salih Sûzeyî, Nalî Xwêndineweyekî Serdemî, R.14

wêneyên tê de çawa hebûn hebe! Lê piştî wê fenabûn çavên min û wêneyên di nava wan de, wê wateyê nagihîne, ku hezkiriya xwe jî nabîne! Nexêr li nerîna mina ter binere, bê çawa rûyê yara min di nav de hatiye nexşkirin. Çawa murîdên neqişbendî wêneyê lefza(Elah) li ser dilê xwe neqş dikin! Ez jî wêneyê rûyê yara xwe di çavên xwe de neqş dikin, ji bo ku yar wiha fêm neke ku dûratiyê ew li ber min winda kirî ye! Nexêr ew hertim li cem min amade ye, neku amadebûneke xeyalî, belku amadebûneke ku bi herdu çavan dibînim û wêneyê wê digirim.[108]

Ew çawe xezale fetaratî ser û male

Ew nergse kale neminî hêşt û nekala

Koka mijarê ewe ku dîtin û hizirkirin ne sedemên sereke ne, belku bi tenê rêyekin ji bo bedewkirin û başnîşandana kesek ê.Ji ber ku bi rastî çavan lênerîneke cuda he ye, crnan yek lênerîn, dehan peyaman himbêz dike! Tişta ku mirov dikare bi rêya çavan bigihîne kesên beramber, ji bo herdu têgînên neviyan û hezkirinê, ne ziman, ne dest û jî qelem nikare bigihîne. Beraet ku bi tenê di çavan de xuya dibe, bedewtiya herî mezin a mirovane û ne bi çav jî be ew beraet nayê dîtin! Têramîn di awazên deng de û çavbiçavketin ê, pirtirîn û lezgîntirîn bandor li ser mirov û kesên li hemberî mirov he ye.[109]

Nalî ew nuqtey kewabû benîşaney çaw

Min lesefhey rohî ew dulbere nîşan da

Mexseda beytê ew e, ew xala bûye nîşan li ser çavê Nalî, li ser textê rûyê yarê bû, ez didim nîşandayin, anku ez nîşanî Nalî didim. Ji ber hendê êdî li ser çavên wî cihê xwe girt. Di vê wateyê de bi zelalî derdikeve ku xalek li ser rûyê yara Nalî hebû ye, ji

---

108 Amadekirdinî M.Alî , Nalî Her Lelutkedaye, R.224

109 Qenîi Xurşîd, Îşq Lenêwan Eqil Û Ayinda, Çapa Sêyem, Sal2009, R.113

wir jî hatiye ser çavên wî û bûye tane. Ji hêleke din ve wê wateyê jî didie, ku ji derdê xala rûyê yar ê, cihê wê li ser çavên wî peyda bû ye.[110]

Lewkatewe bîstûme dîtnit beqed çawe

Her mûm lebeden eynî fener çawe

Her mûyek bi canê wî ve ye, dibe çavek! Ji ber hindê Birtrand Rasil dibêje, yek ji wan xalên li cem xelkê sofî û arifan heyîn ku herîzêde bala min dikişîne, min ji wan çêtir nedîtine, (ranazên, aktîf in), tiştekê ji we re dibêjim, matamyî nemînin, (tuştekê nedî wan, ew tiştekê nadin te!) Di çîrokên wan de hatiye ku tiştan didin, neku tiştan werdigirin! Qelemê bi kê û kê dide! Heta bi stêrkan, di wêjeya Îsra û Mîracê de hatî ye, ji ber ku ewqas mezin dibe çav û dilên wî kesî vekirî ne, eqlê dilê wî vekirî ye, ewqas mezin dibe ku hemû hebûn nikare wî bigre xwe! Nexwe vekirina besîret ê, mezinbûna hundirê mirov e. Tu çavên xwe bineqîne, destên xwe li ser çavên xwe deyne, çav bi tenê helametek e, tiltek biçûk e, niha veke, dinyayek e![111]

Di helbestê de, motîfa(çavî) pir hatiye bi kar anîn. Di vir de (çav) ne bi tenê çavê normal e, ne (eyn)e bi têrma erebî! Belku (basîre) ye, basîre jî ew tişt e, ku di felsefeya îrfana îslamî de, dikeve ji beriya(eyn). Îca li nîvedêra yeke biner(Lewkatewe bîstûme dîtnit beqed çawe), tenê rêya dîtina mirovan çav e, lewra (Her mûm lebeden eynî fener çawe), hemû mûyên canê wî bûne çav, weke find ê.[112]

Nezanim xew le çawitdaye yan çawit le xewdaye

Di bê nîvedêrê de, Nalî gihaye asteke wiha di huner û hestyarbûnê de, ku bi rastî jî mirov dikare jê re bibêje(iîcaz)! Bi hûnandineke sihrî, gotinên matryal û

[110]Tehsîn Heme Xerîb, Pêxembernasî, Çapa Yekê, R.149_150

[111]Tehsîn Heme Xerîb,Dil ÛÇaw, R.150

[112]Tehsîn Heme Xerîb, Dil ÛÇaw, R.150

manewiyên wisa tevlihev kirine, ku xewa(merhûm) li gel çavê(mewcûd) weke esl û wêne lêhatine, ji hevdu nayên cudakirin, nayê zanîn kîjan di kîjanê de ye![113]

Heker îrfan dilê olê be, nexwe dilê herîdiyar ji wan ola îslamê ye(hunera îrfanî).Anku huner dilê îslamê ye, lê ji aliyê çav(beser) ve, lewra Mewlana dibêje: "mirov bi tenê dîtin e!". An jî her ji ber vê ye ku Nalî konsantrasyonê li ser çav dike.[114]

Eql peydakirina wateyê ye, di nava wan tiştên sade de. Ji berê de ev wateya eql e, anku(sûret)ê tiştan te nexapîne,wateya tiştan peyda bike! Ew eqlê şihûdiyê ku hebûna wî di nava mirov de he yî, wateya besîretê ewe wateya eql. Eql anku tu bi dûv wan wateyan bigerî ên ku di nava wêneyan de heyin. Wêne te nexapînin, hindî tu di nava wêne(sûret)an de bimînî, rêya te bi wateyê nakeve! Ku rêya te bi wateyê ket, hingê tê maneya eql! [115]

Pêm delên mecbûrbe xêl û qîçe meylî şer dekat

Xêl û qîçe ya terazûy nazî nextê ser dekat

Nalî lûmeyan ji yara xwe dike, weke xêl û keçbîn nîşan dide, dest daye sedemê û di şûn kiryarên dirist de tesîrên kirye ew jî belgeya bê fîraset û bê besîreta wê ye.

Arifê rastî li ser aliyê dinê sedeman jî xwedî agahiye û dizane sedema sereke bi tenê Xwedê ye, her ewe bandorê dide sedeman û dikare serencam ji wan bi dest bikevin. Anku failyet jî bi tenê ji bo wî vedigere... Kesên arif ji van du heqîqetan fêm dikin û lê serwexin û kesên wisa ji merîfe û îmanê razan dizanin.Ev dêra helbestê

[113]Mesûd Muhemed, Çepkêk Legulzarî Nalî, Dezgay Çap Û Bilawkrawey Aras, R.88

[114]Tehsîn Heme Xerîb, Dîdêk Bo Dînnasî Nuwê, R.488

[115]Tehsîn Heme Xerîb, Pêxembernasî, Çapa Ykê, R.142_143

belgeye li se kûratî û baweriya îrfanê li cem Nalî, ku yekbûn(wehdet) hizr û têramîn.[116]

Ka em bi rêya vê mînak ê, têramînê ji bo meziniya helbesta Nalî bikin, ne bi biryarên pêşwext û giştî, belku bi belge, hestewarî û hûrgulî. Di vê mînakê de ku Nalî weke behaneyekê ji bo dîtna yara xwe anî ye. Dinyayeke bedewî û diristî he ye, çi ji aliyê zanînê ve, çi jî ji aliyê hilweşandina serdemî. Çi jî di asta waje û mufredatên kelamî de, çi di asta bedewî û xulqandina hestê xweşkirina muzîkê de.[117]

Anku ew nexweşikiya ku li cem te nexweşik e, li cem min xweşik e. Anku pîşîna mirov bandor li ser bînîna xweşikiyê he ye. Lewra jî arif di meseleyên duayên temendirêjiyê de bûne du grup. Grupek dibêje nabe mirovê arif duaya temendirêjiyê ji xwe re bike, ji ber ku ew temendirêjbûne pitir astengiyan li hemebr gihiştina wî bi meşûqa rastî peyda dike. Grupa din dibêje mirov dikare duaya temendirêjiyê bike, l, bi merc, ku di serî de mirov hesaba xwe rast bike, mexsed perspektîfa xweşikbîniya xwe rast bike. Ew qalçiyê ji xwe re dikin mînak, çinku heker di serî de hesaba xwe rast neke û xwe ji nava pîsatiyê dernexe û duaya temendirêjiyê bike, ew ê her di nava pîsiyê de bimîne! Pêdiviye yekemcar ji wî ciyî derbikeve, hesaba xwe rast bike û paşê duaya temendirêjiyê bike.[118]

Nalî bi du awayan li vê mijatê dinere:

Yekem: Weke di van dêran de xuya dibe, perespektîfeke fenomenolojî ye. Anku xwe xistiye şûna temaşeker, xwendevan bi çavên xwe hemû ezmûnan de ye, nuke awî yadgaryekandaye lîreda çavêt wî.

[116]Amadekirdnî M.Elî, Nalî Her Lelutkedaye, R.222_223

[117]Ebdalxaliq Yeiqûbî, Govarî Koç, J.17 û 18, Nalî Lenîştîmanî Meîrîfewe Ta Xurbetî ziman, R.362

[118] Tehsîn Heme Xrîb, Dill ÛÇaw, R.238

Xîlêt xuşewîstya wye. Ne weke raveker û helbestvanên berê ku bi nerîna wan bi tenê çavên kevokê xweşik in! Nalî di çavçn xwe de çavên Mehbûbeyê jî nîşan dide û rêyeke din ji bo statîkaya sinetî diafirîne.[119]

Nalî çavên Mehbûbeyê yên wîr dişibîne dengeyek ê, ku aliyek şorbûye jêr û yê din bilind bû ye, sedema vê bilindî û nizmbûnê jî naznên Mehbûbeyê ne, neku wîrtiya çavên wê! Herwisa sedema biçûkî û kêmiya çavekê û meziniya ê din, bi rewşa nêçîrvanekê dişibîne, dema ku ji bo nêçîrkirinê çavek xwe diniqîne, da ku tîra xwe rast biavêje û nêçîra xwe bike. Meehbûbeyê jî ewha wisa çavê xwe kêm kiriye da ku kutra birjana xwe biavêje û li dilê dildarê xwe bide.[120]

Çavên ku nazan lê nmînin car car hinek bilind dibr û yek ji yekê girantir dibe. Qîma Nalî nehat bi tenê bêje Mehbûbeya min ne wîr e, belku bi awayekê behs li vê wîrbûnê kirî ye, ku gihandiye asta nezaket ê, çavên wê kirine denge! Dibêjim(çav) ji ber ku wîrtî û xwehrî di çavan de ye. Hema hema bi wan çavê îca ê naz bike! Di wê demê de nazan pê nhilkêşe.[121]

Çawî hemerengî gulî mestî şew û rojn medam

Yek leşkuftey we ew  uşew yek le nîw ferdeka

Piştî teqîna wênî sereke, tesbît kir, ku cavên Mehbûbeyê bi wîrtî jî xweşik in.

Tutî to le hîrsî dil dawî temi dekate mil

Bulbulî min le eşqî gul texniye û teref dekat

[119] Salih Sûzeyî, Xuyindineweyekî Niwê Û Serdemîyane, R.18

[120] Qanixurşîd, îşq Lenêwan Eql Û Ayinda, R.31

[121] Eledîn Secadî, Mêjûy Edebî Kurdî, R.246

Nalî di vê dêra helbestê de ne bi tenê serfa xwe ji ya tûtîbêja cida dike, belku êrîrşî wan dike û dibêje ew ji kû dizanin xwehr û jor kîjan in![122]

Eksî çawî to le çawîda be xwar têdegat

Keçnezer, key ferqî  xwar û jor xêr û şer dekat

Katibî xêr û şerî uşaqe bo wesl û fîraq

Lutf û qehrî be carê seyrî dû defter deka

Bi nerîna Nalî çavên Mehbûbeyê bi lutf û qehra xwe aşiq rastî wesl û fîraqê kirine! Çavê lutfê ji bo hinek aşiqan vedike û bi dîdara xwe wan şad dike,. Di heman demê de, çavê xweyê din, çavê wîr, ku çavê qehrê ye, ji bo hinek aşiqan vedike û wa ji wesla xwe mehrûm dike! Lewra aşiqê Mehbûbeym di wesl û fîraqê de dijîn, çavên wê bûne weke melekên xêr û şeran, grupekê dibe bihoştê û grupa din jî di nava dojehê de ji bîr dike.[123]

Nalî di hinek helbestên din de, mînak ew helbestên ku behsa Hebîbe û Mehbûbeyan dikin, gotina Hebîbe û Mehbûbe navek dine ji bo jinek ê, ku heya niha em navê wê yê heqîqî nizanin Nalî ew bi veşartî hiştî ye.[124]

Pêncî carên din navê Mehbûbeyê hatî ye. Ku eve wê çendê serrast dike, ku bi rastî jî navê yara Nalî Hebîbe bû ye. Bi nerîna mina teybet, tu kes bi navê Hebîne nebû ye, bi tenê ev nav ji bo bedewkirina teksta helebsta xwe bi kar anî ye.

Belê di rastî de ev tekstên klasîk hemû tekstên bedew û xwedî selîqe ne. Ne merce dêra helbestê bi mesdeke dildarî hatibe gotin, ji aliyê helbestvanî ve helbestvan bi xwe di nava ezmûneke hezkirinê re derbas bûbe. Mexseda min ev tekst bi xwe bi xweşikî hatine avakirin.[125]

---

[122]Salih Sûzeyî, Xwêndineweyekî Niwê Û Serdemiyane Bo Nalî, R.18

[123]Amadekirdnî M.Elî, Nalî Her Lelûtkedaye, R.223_224.26

[124]Rêbwar Sêweylî, Kitêbî Nalî, R.131

[125]Muhemedî Mela Krîm, Nalî Le kilaw Rojney Şîrekaniyewe, R.28

### 2.1.2 Nalî û Mestûre

Mestûre ke hesna û edîbe behîsabê

Hate xewim emşew be çi nazêk û îtabê

Hatûm utî: uqdem heye, qet mumkîne wabê

Hî tom egerem mesele hel ekey bebê cuwabê

Hermesele bîgrê ke beto şerhî kirabê

Mumkîn niye kes dexlê bika çîn û xeta bê

Ayîne be mayîne debê reng nomabê

(Mestûre) bemestûre debê muhre guşa bê

Nuktêkî zerîfe, benesîbî zurefa bê

Teirîfî dekem belku lebo derd şîfa bê

Em sîre çiye, mîslî suhabê, neswabê?!

Durî ke weku durî semabê, nesma bê?!

Dukkanî tuhef, kanî heya kanî beqa bê

Qubey leqîbabî nuqeba bê nequpabê

Wek xeyme beperdêkî dû estûne bepabê

Sertîlekî nextê benezakt qileşabê

Wek hîmetî sofî kelenêw xelwe xizabê

Mestûrew ezîzî şeref û rêfet û cabê

Yakomele zîwî buxela, dûr lesexa bê

Muxleq bebexîlî bemesel mistî mela bê

Kasêkî blûrînî nixûsî leserabê

Nextêkî leber mewcî letafet qileşabê

Yaxo pele befrêkî keeslen neşkabê

Qendîlî munîr û guzerî ab û hewa bê

Kam ab û hewa? Muitedîlî neşu nima bê

Ye'nî leweset kanye germêkî tê zabê

Lewkanyeda çûzere rêwasê ruwa bê

Bew çûzere rêwase kemêkî qileşabê

Yaqesrî muela, ke leawêne kirabê

Yaxunçeyî neşgofe, ke awî nedirabê

Ya gumbedî nezhetagî nêw baxçey serabê

Elwanî gulamêz û şeker mêzî tiyabê

Cêyî qetre awêkî lenêwda qileşabê

Yagirdekî girdêkî keşîrîn helîdabê

Girdî nimekîn, yeinî giyayî lê neriwabê

Damênî be enwaî gul û mil xemla bê

Gencêkî tiyabê ketîlesmî neşkabê

Huquqêkî zerî safî leserbanî nirabê

Nextêkî besed senetî(Manî) qileşabê

Ya resî yetîmêkî kebê berg û newa bê

Xeltan û serasîme, nedakêk û nebabê

Firmêskî spî û tundî lekeley kelî nabê

Hêştaku leheq cêgey xasî nedirabê

Çespîdew xirrherweku berqalibî dabê

Nextêkî leber tundî û seqfî qileşabê

Drucêkî mûcewher kehemû husn û behabê

Durrêkî mucewher kehemû awî sefa bê

Beyzêkî şuturmurxî kewa taze kirabê

Wek beyîzey beyza bezya û besenabê

Xirçêkî mudewer, beesel awdirabê

Nextêkî leber husn û helawet şileqabê

Yaxud weku xoy şahîde bawesfî weha bê:

Sîmîn memkêkî heke taze helîdabê

Yataze henarêkî kenarî gulî mabê

Bê dirz û qilêş mîslî şemamêkî tela bê

Botecrebe talezetî şîrînî edabê

Nextêkî wek dîdeyî derzî qileşabê?!

Yaxo, mesela, mîslî newa bêt û newabê

Meşhûr û xefî herwek enqaw û wefa bê

Sahêb zer û zîwê kefrîbî uqelabê

Îksîrî telay ehmerî çen qetre lelabê

Deiway umera çende leser textî kirabê

Çen xwên ke rijabêt û çi xwênê nerjabê

Kê bê lecîhanda çi geda bêt û çi şabêt

Terkêkî wanasik û pir lezzetî gabê?!

Dêwane kezanî debê uqdeşabê

Hestaw gutî: eşkî rewanim befîda bê

Em sahêbî teşrîhe debê heyetî çabê

Hem şarîh û hem carîh û mûzîxe kuşabê

Bo tund û reqî metnî metînî hukema bê

Tedqîqî emîş sîre debê xufye edabê

Nerm û xoş û muntîc weku bestî udeba bê

Tulanî û berceste, weku destî duabê

Şew naîm û qaîm elemî babî rezabê

Bê dîde helsitê bemesel eynî esabê

Meczubî turuq, murteîşî lerziş û tabê

Salêk rewşî meslekî rêgey sulhabê

Ferqêkî hebê: daxilî mîhrabî recabê

Çawêkî hebê: xerqî firmêskî buka bê

Rêyî hurmet û bêhurmetî hergîz nekutabê

Çen awî rjabêt û çi awî rjabêt

Lem rêge serîşî biçê yeinî kujrabê

Gerdin keçî berpête, qedem renceke,sabê

Tagerimrewî rêgey zulmatî beqa bê

(Ma'el-xufir)it qetre leser qetre fîda bê

Kê bê weku to bem şewe rehmî bemina bê!

Meczûbe sîfet, yeinî sîley rehmî têdabê!

Hem cazîbe û qabîleyî exz û etabê!

Mestûre û mexfî, şebehî badî seba bê!

Mestane helsitêt û bekwêrîy ruqebabê

Em bab zene gerim terî ka beke babê

(Nalî) were hezlêkî ke arî şuera bê

Rûş meke pêyî sefheyî her lewh û kîtabê

Tehrîrî xeyal û xew, eger bête hîsabê

Derwêş û geda şah û, debê şah gedabê

Waçake xeyal û xewit esrarî hudabê

Nek behsî surûr elem û badî hewa bê[126]

Rîwayet û behskirineke sade ya xewnekê ye,  tê de Mestûre tê pêş çavên helbestvan û dibe destpêkek ji bo naskirina Mestûre yê.

Mestûre di vir de bi naz, îtab û edîb xwe nîşanî helbestvan dide. Li vir ji bo me xuya dibe, ku hevnaskirineke hindik di navbera herdu karan de he ye. Di heman demê de, Mestûre bi awayekî zelaltir Nalî bi me dide naskirin. Bi vî awayî helbestvan derbara Mestûre û Nalî, rola vegêranê dilîze û di heman demê de nivîskarê helbestê ye.Htina Mestûreyê di helbestê de, qemiwîneke dibe sedema

[126]Dîwanî Nalî, Mela Ebdulkerîmî Muderîs Û Fatîh Ebdulkerîm, Çapa Şeşê, R.604_630.

windabûna helbestvan, an jî windabûnê vegêr û windabûna bûna kesê yêkemê guhgir. Helbestvan xewnek dîytî ye, paşê helbestek nvîsandî ye.[127]

Hey tom eger em mesele hil nekey be cewabê

Ev rastî ye, ku Nalî(Mesturey)yê weke mest û edîb dide nîşandayin. Lê ev yek normal e, anku gengaze ku ev wesf ji bo her jineke din jî werin bi kar anîn.

Hesna, jineke bedew û bi îtab e, bi lûme û gazin e: Anku Mestûre bi weke jineke bedew tê wesfkirin. Îşev hate xewna min, lê çi naz bi ser min de dikirin! Gazin û lûme li min dikirin.

Beneşey Sitî û Mestî weha(mestûr) û (mexmûre)

Nezanim xew leçawtaye yan çawit lexewdaye

Ev beyta helbestê ji birûyan me digihîne çavan

(mestûr)nixumandî, pêçayî bi erebî

Peyva(mestûr) bi erebî, anku bi sitar û nixumandî. Lê heker bi kurdî em behsa(mestûre)yê bikin, wateya wê dibe, zêde mest. Mestûre gotineke koka wê (mest) e.[128]

Nalî di helebstên Mestûre de, berûvajî perspektîfa îpsîtolojya wê serdem ê, behsa berena Mestûreyê dike û bedena wê keşf dike. Nalî di helebstên Mestûreyê de, dema ku bi awayekî lojîkî behsa Mestûreyê dike, weke temahkeriya mêr danê, ne weke arzek ê. Di vê beşê de, bedena jinê xistye hemeber birsyare ê, ku li pey bersiveke pir gunav û mêrane digere.

[127]Rêbwar Sêweylî, Kitêbî Nalî, R.31

[128]Mesûd Muhemed, Çepkêk Le Gulzarî Nalî, Dezgay Çap Û Bilawkirdnewey Aras, Çapa Yekê, R.75

Ev pirs kêm caran bi temamî tê bersivandin. Bersiva wê girêdayî jiyana mirovan e. Ya rast, Nallî Mestûre di xewna xwe de nedîtî ye, belku wî ev yek gotî ye, ji bo ku di xewnê de xwe ji wê realeteya rewşa seksiya derbas bike. Dûrketina Nalî ji heqîqeta Mestûre, ku di xew de dîtî ye, zimanê wî giran kiriye û hewl daye, ku vê dîmenê li gel fantazyeke heqîqetî ve girêditin, meznî û gringiya vê fentazya Nalî bi awayekî xweşik û ew fentaziye girêdaye bi aliyên olî û pir xweşik aliyên olî parastî ye.[129]

Bi nerîna min, ew jina ew behs dike, qet ne ev jine a ku niha em dibînin, ji beriya zewac ê, an piştî zewacê em pê re dijîn. Belku ew jin jneke bi raze ji bo mêrê xwe. Weke wê yek ê, ku di wê demê de, ji bo hemû tiştan du nirxandin hebûn.Yek ya nedîtbar e, ku piraniya helbestên wê demê ev awaye ne. Du, ew bû ku hîkmeta nedîtbara mijaran, gelek ji hîkmeta dîtbar zêdetir bû.

Bi nerîna min û gelekên din, ku lêkolîn kirin, di helbestên wê demê de, ew jin ne ev jin, herweke xuya dibe piranî mexsedên helbestvan veşartî bûne.

Ew jina li cem helbestvanên klasîkî tê behskirin jineke nexuya û ne normal e. Lewra ev mirov nedîtbare û tukes nikare wê bibîne. Ne gengaz e, ev hemû sîfet di jineke normal de hebin! Belku helbestvan bi xwe di hundirê xwe de ji bo xwe afirandine û gihandine asteke bilind, ku di bin xwedawendane de ne! Kesên lêkolnan li ser helebstên îrfana îslamî didkin, gelek caran rastî şik û gumanan tên, li hemebr wê eşqa ew helebstvan ji bo Xwedê xuya dikin! Gelek caran bi eşqa meşûqên helbestvanan re tvelihev dikin.[130]

Herçende ke însane leber çawî min û to

Mumkîn niye em lutfe le însan beşerda

---

[129]Mesûd Bînende, Govarî Goç, J.17û18, Ruwanînêkî Xwarûxêç Bo Nalî, R.317_320.32

[130]Tehsîn Heme Xerîb, Dil Û Çaw, Çapî Duwem, Nawendî Roşnibîr Bo Çap Û Bilawkirdnewe, 2011, R.206_207

Dirêjya helebsta xewna –dîtina Mestûre- yê, hinek sîftên aloz û biguman he ne. Heker lêkolînvanek zîrek û xwedî şîyanên mezin ne be, nikare rastî û dirisitya mexseda helbestvan bizane. Sineyîbûna Mestûreyê meseleke cudaye di nava dîroka me ya nû de. Nabe ji bîra me biçe, ku ev gotinên wêjeyî ne, hinek helbestvanên nû he ne, li şûna ku Nalî nas bikin, li ser diaxivin û dibêjn, ew wesfên Nalî ji bo Mestûreyê kirine, dûrin ji aliyên exlaqî û ji blî hinek gotênin din. Herwiha dibêjn, bila li şûna Mestûre yê, çar dêrên helbestan ji bo min gotbane, ne ji bo bajêrî siney û sineyîyan. Bi vî awayî gotinên xwe dikin, bê ku şarezayî di mexsed û hundirê Nalî de hebin.[131]

[131] Amadekirdnî M.Elî, Nalî Her Le Lutkedaye, R.315

## 2.2 Nalî Û Hevzayendî(Homosexual)

Îşqit, kemecazî bê, xwahîş meke îlla kiç

Şîrîn kiç û, Leyla kiç û ,Selma kiç û,Erza kiç

Ferqî kur û kiç roştin wek ferqî meh û mêhre

Em ferqî şew roje, wek ferqe lekur ta kiç

Meh meh lemehî sade: yeinî leqemer lade

Hem şems û sureyya kiç hem zuhreyî zehra kiç

Bê bêne gule jale, hem bê bere, hem tale

Qed ser û sinewber kiç, çawnêrgisî şehla kiç

Kur weku gulî gulzare, emma semerî xare

Wek henguwînî çizûdare, henguwînî museffa kiç

Kiç perçemî çîn çîne, dumemkî leser sîne

Wek şaneyî henguwîne, bo lezetî dinya kiç

Cezlî semer û saye, bo sewletî eida kur

Nexlî semer û semaye, bo dewletî dinya kiç

Kur zîbî debustane, kiç şemî şebustane

Bo bezmî temaşa kur, bo xelwetî tenha kiç

Mû sunbulî aşufte, dur daneyî nasufte

Dem xunçeyî neşgufte, têfkre kure ya kiç!

Kurr ayneyî husnî, tawek kiçe, menzûre

Girtî ke xubarî mû, çînî kurr û mîna kiç

Kur tazew ter, madam taze weku xuşkî bê

Emma ke riwa sebze, dîba kur û, zîba kiç

Boşerbetî şîrînî fincane leser sînî

Mem tufheyî tuffahî, şem enberî boya kiç

Hem gulbenî bêxarî, hem mezreî ezharî

Hem mexzenî esrarî, îsbatî mezaya kiç

Cennet prî wîldane, xadim hemû xîlmane

Xanim ketêda horîn, yekser hemû hesna kiç

Ger eşref û mehbûbe, Yûsif kurî Yeiqûbe

Kiç bu bexirîdarî, yeinî ke Zuleyxa kiç

Sîddîq û Ezîz, herwek Yûsif kenebî bû kur

Sîddîqeyî meisûme,wek dakî Mesîha kiç

Babêkî heye bo îşqî mecazî, bes

Nalî çîye ewbabe! Adem kurr û Hewa kiç![132]

Di vê perçeya helbestê de, ji bo me xuya dibe. ku huner ne ewe kesek daxwaza tiştekê bike, ku ew tişt ne ezelî û heta hetayî be! Ev ne zelamên rastî ne, anku evîn û hezkirina dinyayî tiştek bê bingehe û demkî ye, bi tenê xew û xeyalek e. Dildana bi vê jiyanê tiştekî bê biha ye.  bîojîtevan kesên ku di dema xwe de jiya ne, xwe girêdayî xweşî û lezeta dinyayê nakirine. Mexseda sêyema bê helbest ê, dibe ku ew sixrî xweşika di navbera kur û keçan de dyar nedevt  ku ştekî, xweşik û balkêş, di heman demê de hêza hunera xwe bide nîşandayin. Ji aliyekî din ve, hêz û desthilata

[132]Deqî Dîwanî Nalî, Çapa Yekê, A. Etaula Hewarî Neseb, Bilawkirawey Kurdistan- Sine –Îran, 1391, Hetawî, R.139_140

xwezayê xuya dide xuyakirin. Weke çawa du çînên yekregez di jiyanê de dijîn yek in, lê bi viyan û hezkirina nava mirovan jiyan dewam dike.[133]

Anku di vir de, Nalê ne hean ew Nalîye ye, yê ku em di helbestên din de nas dikin! lê hîn zûye ku biryarê li ser bidin,çinku arastekirina aliyekî ji aliyên heleb layenên helbestên din. Ne merce hemû gava yek nerîn hebe û yekaliyane biryarê li ser helbestên wî bidin. Pêdiviye em lêkulînên hûr bikin, ka gelo ew Nalî her ewe yê ku di piraniya helbestên xwe de xwe diyar dike? An hewla bersivdayina van du pirsan bikin: Gelo derbirîna(eşqa heqîqî di wê helbestê de ji helbestên din cida dike, an hemû pêkhateya helbest ê? Gelo helbesteke din he ye, ku heman araste he be, an na?).[134]

Taybetmendiyeke din a helbestên Nalî, berê hurêrn û helbstên xwe ji bo arasteya ji bo modela mexsedên diyar û nediyar veguhestî ye.

Eger alem bibête xelmetî teşrîfî sertapay

Ucûdî bê ucûdî bê suba hat û mucered bêt!

Eger tekye, eger şêxe, hemû dawî elayiq bûn

Bala Nalî biçêt mestî xerabat û mucerred bê !

Îşqit ke mecazî bêt, xwahîş meke îla kiç

Şîrîn kiç û , Leyla kiç û, Selma kiç û, Ezra kiç

Ferqî kur û kiç roşIn, wek ferqî meh û mîhre

Em ferqî şew roje wek ferqe le kur û kiç

Çima tercîha xelkê dike, ku heker eşqa mecazî, an duqolî bikin, bila bi ciznsê beramber re biken, ne hevzayendî. Ev çi mijara civakî ya navdare ku Nalî radixe ber çavan.

---

[133]Sdîq Borekî, Mêjûy Edebî Kurdî, Bergî Dû, R.547

[134] Amadekirdnî M.Alî, Nalî Her Lelutkedaye, R.167_168

Babêkî heye dunya bo îşqî mecazî, bes

(Nalî) çîye ew babe! Adem kur û Hewa kiç

Başe çima melayekî weke Nalî ev tişt gotî ye? Diyare mamoste Ebdulkerîm Muderis weke kesekî arif û oldar xwe ji vê mijarê dûr kirî ye! Nikariye mexsed û hizra Nalî di vê helbestê de diyar bike.

Lê Hêminê helbestvan dîwarê bêdengiyê dişkenîne û dibêje,

Nalî di helbestê de behsa bedewiya jinê dike û hevzayendîtiyê rexne dike. Ku wê demê di nava civakan de, bi taybet di nava tirkan de pir bû. Ew weke guneheke mezin wesf dike û weke nexweşiyeke cizsî bi nav dike. Lê bi sivikî tênta berrh û dibêje, Nallî weke helbestvan û melayekî olî, xwestiye vê meselê çareser bike. Û di vê helbestê de ji bo me xuya dike, ka heya kîjan astê pergala exlaqî û civakî pê wêran bû! Eşq li cem Nalî du cor e, eşqa heqîqî, ku eşqa xwedayiye û eşqa mecazî û dinya yî. Ji bilî wateya wê helbestê ya lefzî û navê jinê îmajeke ji bo Şirîn û Xusre, Ferhad û Leyla. Dîsa ji bilî wateya lefzî, cardin ev helbest îmajeke ji bo hez û xweşî û bedewiya jin ê, îmajeke ji bo Leylaya Qeysa Amirî... (Selma)[135]

Nalî dibêje:

Heker tu di destpêka eşqê de mecazî bû yî, eşqbaziyê neke, çinku tuxumê hezkirinê di hundirê mêran de zûtir wererê dike û ber digire.

Lê heker mê, an keç bû, yekem hezkirin û yekem ezmûn bû, di nava çend ezmûnên şiksetî de derbas nebû be, ew ê zû bi hezkirinê ve were girêdayin û pitir ê bigihîje menzil.

Babêkî heye dûnya bo îşqî mecay, bes

[135] Dîwanî Nalî, Mela Ebdulkerîmî Muderîs, Fatîh Ebdulkerîm, Çapî Şeşem, Bilawkrawey Kurdistan, 1387, R.162

Nalî çîye ew babe: adem kur û hewa kiç

Eşqa mecazî, an hezkirina seksî, pêdiviye di navbera keç û xortan te pêk were, ne hevzayindeyan. Ji ber ku xwezaya wê wisa bû ye, lê mirovan serûbinî kirî ye, nexwe nabe nêr bi nêr re, an mê bi mê re eşqa mecazî bikin. Ev beyta helbestê wê nîşanî me dide, ku ji aliykê ve, ev helbest diçe nava kategoriya hevzayendîtiyê de. Ji aliyekî din ve, Nalî nerîna xwe li ser vê mijarê xuya dike û radigihîne ku ew ne bi vê yekê re ye.[136]

Kake Heme bi çend beytekan Nalî bi wê yekê sûçdar dike, ku piştevaniya hevzayendeyan dike. Kake Heme di çen beytên şiranda nalî tawanbar dket û bêjît ku nalî piştevanya hawregezbazanda dket. Kake Heme li ciyekî din jî, Nalî ji gorê radike bi van axiftinên weke di vê beyta helbestê de.

Nalî i vê helbestê de kurt û kurmancî li dijî wane ên xortan ji keçan baştir dideynin, bi belge tehedayê dike û di vê helbestê de methên keçan dike û turewe navête kuran ku karê hevzayendiyê bikin. Ferqa kur û keçan ji hev zelal e, weke roşn ferqe meh û mîhran.

Ferqî kur û kiç roşin wek ferqî meh û mîhre

Em ferqî şew û roje wek ferqe le kur ta kiç

Diçenbeytên şîîranda nalî tawanbar dketû bêjît kû nalî piştevanya hawregezbazanda dket . Kake heme chekê dêjî hezretî nalî dnav gurî vîda hişyar keteve bi van axaftên wekî vî beyta şîîrda .

[136] Zana Xelî , Îrotîk Le Şîrî Nalîda, Çapa Yekê, Dezgay Aras, 2012, R.96.

Em taqime mumitaze kewa  xasey şahin

Aşûbî dilî memleket û qelbî supahin

Sef sef ke dewestin bener xettî şuaî

Helteke bedestin weku fermanî mahin

Tu guman tê de tu ne, ku Nalî ew beyta helbestê ji bo methikirin û wesfkirina leşkerên Ehmed Paşayê Baban gotine, ku taximeke lawên xwîngermên çekbidestên Baban bûn.  Ku ev mîrgehe parastibûn û remza parastina yekem statûya kurdî bû ne. Ev jî tiştеke pir normal e, di nava her gelekî de. Bi nerîna min, Nalî ev helbest ji bo aliyê siyasiyê sê welatê xwe gotine.[137]

Vî durî mumkine û dibe, ku ev taqime mimtaze aşuba û Sulêmanî ne, di heman demê de, "dibe qelbê supayê" şahanşa bin.[138]

Ev xeze le ku methên xulamên Ehmed Paşa dike û baştirye  ji methên wan ciwanên nûgihayî bi eşkere vê jî der dixe, ku paşay ji ber bedewî û rindiya wan ciwanên nazik û nazdarên nûgihayî, ew kirine dergehvanên mala xwe.[139]

---

[137]H, Ç, R.33

[138]Mesûd Muhemd, Çepkêk Le Gulzarî Nalî, Çapa Sêyem, Çapxaney Aras, 2010, R.185

[139]Hemey Mela Kerîm, Nalî Le kilaw Rêjney Şîrekanyewe, Çapa Duyem, Aras, 2009, R. 91

## 3 EŞQA NALÎ

Le dilda ateşî îşqit bilêsey mîslî tendûre

Şetî eşkim nebê manî, desutêm debime koy nûre

Benarî îşq û awî dil,cesed wek hezretî Mûsa

Terîqî: behrî Fîrewn û refîqî: ateşî Tûre

Deçê bo lay reqîb, xoşe, welê ew daxe kuştûmî

Le kin ew çende mecbûre, le lay min çende mexrûre

Peyamit hat û peykit roy , xeyalim nard û negey

Resûlim kewte rî, girtî ,hênay ek agire sûre

Kedîtim şeklî sed rengî, gutim babayî eyyare

Kebîstim lefzî bêdengî, gutim şeypûrî şapûre

Gutim: rastî seba helse! Gutî: meşrîf muxalîfe

Gutim: narê, gutî: baye, gutim: ewcê, gutî: dure

Gutim: qurbanî to min bim, gutî: qurbanî to seg bê

Gutim: şîşey dilim natwê? Gutî: boçîme? Meksûre

Xerabatî dilî ((Nalî ))mefermû: xaliye nayem

Bemergî to qesem çawim , bezîkrit beytî meimûre

Wesfî ruxsarî lefîkrî benî adem beder

Îbtîday mehî demî wek xeberî bê esere

**New** nîhalî qedî to erere,dilixwahî mine

Raste dildare, welê heyfe bê emere!

Qametî serûy eger bê bere bo çi narewene?!

To bilê zulfî eger dûkele bo çi narî bere?!

Zulf eger dûkele, dûkel berî gulnarî niye!

Serwe ger qametî, key serûy rewan barewere?!

Beheqî cerî heyasey zer û kakolî serî

Dilî gum geşteyî min guşteyî pişt û kemere

Bê eger bête dert, dîdeye berşeq weku go

Niye zatîşî neyê dil, çi bika, qur besere

Le demî naleyî zarim, dilî pir zemzemekem

Welweley helq û gerûy((Nalî)) legerdûn bedere[140]

Di rastî de du corên eşq he ne, eşqeka esmanî û eşqeke zemînî. Nalî piraniya deman di navbeta eşqa esmanî û zemînî de tefawitê nadeye. Hemû eşqên esmanî bi qasî eşqên zemînî li cem Nalî xwedî rêz û hurmet in. Dîtna kesekê ku du-sê metr bejna wê ye, milpehn bû, an gerek bedewtiyeke bêsinor be. Nexêr, tu tiştek ji vanan nebû, lewra eşqa esmanî û xwedayî di hundirê helebstên wî de ye, lê em hest pê nakin.[141]

Aşiqî bêdil denalê meylî giryanî heye

Bêmêşke hewre tirîşqe tawî kiryanî heye

Dilê aşiqan kiriye  ewr, weke çawa peydabûna ewran bi sedema hêlmê ye, ew jî dema germiya rojê li avê dixe û av dibe hêlm. Eşq jî ji şoreşeke laş, bi sedema

[140]Deqî Dîwanî Nalî, Çapa Yekê, A.Etaula Hewarî Neseb, Bilawkirawey Kurdistan- Sine – Îran,1391Hetawî, R.98

[141]M.Elî, A.Nalî Her Le Lûtkedaye, Dezgay Çap Û Pexşî Mehwî-Silêmanî, 2009P.Z, R.491

germahiya manewî ya meşûqê peyda dibe.  Her dema dijwartir bû, baranê dibarîne. Eşq jî dema ku dijwar bû, ji kela dil hêsran dibarîne.[142]

Çenda ku eşqa Nalî eşqeke paqij e, lê eşqeke madî ye, anku behsa aliyên berbiçav yên xweşikiyê dike. Di vê eşqê de behsa rûyên delalî, bajna zirav û biskên ta bi ta tê kirin.  Ev aliyên berbiçavên evîna Nalî ne. Ew aliyê ku bi rastî agirê evînê bera dil dayî ye, li gorî vê belgyea, ku canê mirov bi xwe xweşikiye û dibe hevalê hertişta xweşik[143]

Gelo em dikarin bêjin Nalî helbestvanekî sofî bû? Bêguman em  nikarin, ji ber ku weke xuya dibe di nava helbestên Nalî de, gelek helbestên metaforî cî digirin, cinku li gorî lojîka ezmûna sofîzm ê, bi tu awayan nabe helbestvanê sofî helbestan bi awayê(eşqa mecazî) bihûne. Lewra eşqa heqêqî anku ya xwedayî, deqî aşiqê heqîqî dibe hemû corên eşqa fîzîkî û têkiliyê  pêşve reng teve.[144]

Eşq li cem Nalî eşqeke mecaziye û paşê dibe eşqeke heqîqî û di nava hundirê wî de dimîne, weke çawa eşqa Mem û Zîn'an eşqeke mecazî bû, paşê bû rastî, Ku Ehmedê Xanî behsa wê di destana Mem û Zînê de dike. Nexwe li cem Nalî eşqa mecazî eşqeke pîroz û bê meslehet e. Ji ber heindê hertim gazinê li sofiyan dike û dibêje, heyf xwe ji jiyan û hezkirina dinyayê dûr dike, seba eşqa heqîqî! Pitir têkiliya Nalî bi xeyalê re he ye, ne bi can. Nalî ezmûneke îrfanî ne bû, weke Mewlewî û Mehwî. Nalî helbestvanekî xeyalî bû û bi xeyalan re jiyaye û giringî pê da ye.  Heker wekheviyek di navbera helbestvanên klasîk û helbestvanên nû de he be(ku na be, ji berku du serdem û dinyayên ji hevdu cida ne), em ê bikarin bibêjin ku di Nalî de ev wekhevî ê were peydakirin.

Mînak, romanên Bextiya Elî bixwîne, ku Bextiya keseke xwedî bekgrawendekî xeyalê ye, ezmûneke rûhî  tu ne, lê xeyal mexlûqeke pir bi hêz e, têkiliyek di navbera aşiqbûna çavan û xeyalê de he ye.

---

[142]H, Ç, R.67

[143]H, Ç, R.123_124

[144]H, Ç, R.185

Lê li cîhaneke rast û pirî raz, lê mixabin ku ev razên îro mayîn hêza xeyaliya îro nehêlan e. Nalî bi xwe bi zelalî behsa vê yekê dike.[145]

ZarIm weku hîlal û nehîfm weku xeyal!

Aya dekewmezarû bedilda dekem xutûr

Dibêje zeîfe weke meha yekşevî, ku hema hema diqede! Zeîfe weke xeyal ê, xeyal dikeve ser ziman, lê eşq nakeve ser ziman. Eşq cihê wê di dil de ye, nyê gotin. Eê ku dibêje eşq tu ne, belku weke xeyalekê ye ji bo derbirîna eşqa xwe rê ji bo xweş dike ku ber bi eşqê biçe, ana eşq li cem aîiq temam dibe.

Lem şerhî derdî xurbete, lem sozî hîcrete

Dil renge bibê be aw e beçaw bika ubûr

Di dawiyê de, Nalî helbestvaneke ku pir xeyal bi kar anî ye. Çav hêsran dibarîne, lê ew dibêje çavên min dilûpeke di nav avê de, anku hêsr gelek pitirin ji çavên Nalî.

Dilim û zehîlî derde wek dîde lexda

Heyran û perêşane weku qetre leyemda

Axaftin li ser jiyana dûrî welat û çand ê, di nava du rêyên sereke de derbas dibe.Yekem: Rêya têkiliya dîasporayê bi hest. Anku têkiliya dîsporayên bi hest û perspektîfên derbara statîkayê ji bo dinya yê.

Duyem: Nalî têkiliya dîasporayê li gel zanîn ê. Anku ew ezmûn nû ya nerîn û perspektîfan ya ku dîaspora bi me dibexşe. Jidayikbûne perspektîfeke din e, ku encama wê têramîn li dinyayeke mezintir e. Lê bi hesteke trajedîk ya mezintir.[146]

---

[145]H, Ç, R.553

[146]Bextiyar Elî, Le Diyarewe Bo Nadiyar, Çapa Yekem, Berga Duyem, Çapekanî Lardo, 2010, R.19

Eşqa Nalî, eşqa fîraq û cidabûnê ye. Eşqa hevrikiyê ye, bi yareke bêxem û hemû xweşikiyeke xwezaya xwedayî, re. Bi vî awa yî, eşq ew zehmet û belaye ye, ku mirovî mijûl dike. Çinku aliyê madî ji nav dibe.

Ew çawe xezale fenaratî ser û male

Ew nergise kale neminî hîşt û ne kala

Bo herkesê mebzû leterîqêkî emanet

Her aşiqî bîçare le rêy xewf û xeter ma

Nexwe peyama yekem ya Nalî, peyama eqş û evînê ye û derbazgeha wê ya eqlîmî jî, hogirbûna bi bedewiya mehbûbê û mubtelabûna bi fîraq û cidabûnê ye. Hinek caran Nalî gelek ji wê bilindtir dibe ya ku em xeyal dikin, dema ku behsa asteke li jor asta eşqê dike, ew ast jî bi bênavî hiştî ye, ku dibe mexseda wî eşqa heqîqî be.[147]

Eşq hewesî meykede û îlmî besîne

Aqil telebî  mudersew cehlî murekeb

Nalî aşiq bû, li gorî heşbest û serdema xwe, lê kêm caran Nalî ew peyve( dil) di navenda helbestên xwe de bi kar anî ye. Weke Mehwî, ku wî(dil) kiriye navenda helbestên xwe.

Herwiha li cem Mewlewî jî navend dil e. Lê li cem Nalî navend(çave), ew bi xwe pir bi eşkereyî behsa vê yekê dike. Heker li cem Mehwî,an Mewlewî dil navend be, nexwe li cem Nalî çav navend e.[148]

---

[147]Dr. Sebh Berzincî, Peyamî Nalî, Govarî Koç, J.17 û 18, R.276_285

[148]Tehsîn Heme Xerîb, Dil ÛÇaw, R.213.

**ENCAM**

Eşq şiştek e, ku ne di bin kontrola mirovan de ye. Belku tişteke ku Xwedê bi beniyên xwe dide. Eşq ne rewşeke ku can rastî hatibe, belku ew bi xwe can e. Can komeke enerjiyan e, ku xweber dernakevin, belku pêdiviye meşûqek he be, heya ku ew enerjî ji nava hundirê wî derbikeve. Eşq destpêkek e, ber bi kamilbûne ve diçe.

Eşq destberdane ji xwenavendiyê û xeyrîxwenavendbûn e. Eşq rîwîtiya dinyaya xeylî ye, derketine ji dinyaya heqîqî û teslîmbûne bi meşûqeke nexuya û winda. Eşqa diyar, eşqa di navbera keç û xortan deye û hezaran çîrok li ser vê eşqê hatine gotin.û nivîsîn. Ev jî wê çendê xuya dike, ka eşqê çiqas bandorê li psîkolojiya mirovan dike û heya digihîne rewşek ê, ku êdî wê eşqa xwe biperêse!.Zulf(bisk) amûreke ji bo pirtî yî, lê ev rende mezin dibe û ber bi yektayî(wehdet)ê diçe. (Tecrîd): Smboleke ji bo devberdana ji jiyana dinya yê. Weke Nalî dibêje: ................ . Birû:  Xala ku tê de wacib(Xwedê - cele celalilu) gehngaz dibe. Weku di Mîracê de Pêxember(S.X) gihaye asteke bolind, ku di Quranê de wesfa wê bi(Qabe qewseyîn ew edna) hatiye kirin. Anku gihaye meqamê herîdawî yê ku mirov dibe bigihîjê. Eşqa Nalî eşqeke heqîqî ye, lê wê eşqa heqîqî di forma eşqeke mecazî de tîne ziman.

**ÇAVKANÎ**

**A_ PIRTÛK:**


1. D.Marif Xeznedar, Dîroka Edeba Kurdî, Berga Çar, Damezrawey Îraqî Bo Rageyandin Û Çapkanî, Bexdad1984.

2.Mesûd Muhemed, Destewdamnî Nalî, Stokolhim, 1997.

3.Serwer Kerîm, Eşq Û Xoşewîstî Lenêwan Wehim Û Waqîda, Çapa Duyem, Çapekanî Akam, Sal 2006.

4.Hîhemed Şahîn, Gulxaney Îrafan, Leblawkrawey Yekêtî Nvîskarên Kurd, Sal2013.

5.Qanî Xurşîd, Îşq Wekî Çemk Ji Bo Jiyan, Çapa Duyem, Çapekanî Sîve, Sal 2010.

6.Tehsîn Heme Xerîb, Rohî Hîkmet Û Nûrî Îrfan Mehwî, Çapa Duyem, Sal2012.

7.Dr.Îbrahîm Ehmed Şwan, Sofîgerî, Çapekanî Wezaretî Perwerde, Çapa yekem, Sal2001.

8.Sdîq Borekî, Mêjûy Edeba Kurdî, Brga Duyem, Çapa Yekem, Çapekanî Tebrêz, Sal 1375 Hetawî.

9.D. Kemal Merûf, Edebyatî Klasîkî Û Niwêxwazî Kûrdî, Çapa Yekem, Sal 2003.

10.Elaedîn Secadî, Mêjûy Edebî Kurdî, Bilawkrawey Kurdistan, Sine, Çapa Yekem ,Hetawî1389.

11.Tehsîn Heme Xerîb, Pêxembernasî, Çapa Yekem, Sal 2010.

12.Salih Sûzeyî, Nalî Xwêndineweyêkî Niwê Û Serdemyane, Çapa Yekem, Senterî Êlbegî Caf, Sal 2006.

13Mesûd Muhemed, Çapkêk Legulzarî Nalî, Çapekanî Korîzanîarî Kurdî, Bexdad,1976.

14.Dr.Avan Elî Mîrza Tofîq, Çinînî Deq Le Şîrekanî Nalîda, Çapa Yekem, Çapekanî Kemal, 2012.

15.Bextiyar Elî, Lediyarewe Bo Nadîar, Çapa Yekem, Berga Duyem, Çapekanî Laro, 2010.

16.Tehsîn Heme Xerîb, Heqîqet Û Şerîet Û Terîqet, Çapa Yekem, Navenda Roşinbîr Bo Çap Û Bilawkirdinewe, 2009.

17.Tehsîn Heme Xerîb, Rohnasî, Çapa Duyem, Nawendî Roşnbîr Bo Çap Û Bilawkirdinewe, 2010.

18.Tehsîn Heme Xerîb, Dil Û Çaw, Çapa Duyem, Navendî Roşnbîr Bo Çap Û Bilawkirdinewe, 2011.

19.Reûf Usman, Nalî Ledadgayî Rexneda, Bexdad, 1984.

20Zana Xelîl, Îrotîk Leşîrî Nalî Da, Çapa Yekem, Dezgay Aras, Hewlêr, 2012.

21.Rêbwar Sêweylî, Kitêbî Nalî, Çapa Yekem, Çapekanî Wezaretî Perwerde, 2001.

22.Deqî Dîwanî Nalî, Çapa Yekem, Etaula Hewarî Neseb, Bilawkirawey Kurdistan-Sine –Îran,1391hetawî.

23.Dr. Ebdula Xidir Mewlûd, Lêkolîneweyek Le Şîrî Ayînî Û Sofîgerî Û Felsefekanî Nalî, Çapa Yekem, Çapekanî Aras, Hewlêr-Kurdistan, Sal, 2001.

24.Farûq Refîq, Hunerî Îşq, Çapa Yekem, Silêmanî, Çapekanî Serdem, 2010.

25. Qanî Xurşîd, Eşq Lenêwan Eql Û Ayîn Da, Çapa Sêyem, Çapekanî Genc, 2009.

26.Mesûd Mihemed, Çepkêk Legulzarî Nalî, Çapa Sêyem, Dezgay Aras, 2010.

27.Mesûd Mihemed, Destew Damanî Nalî, Çapa Sêyem, Dezgay Aras, 2010.

28.Mihemed Baxewan, Ramanêk Le Çemkekan, Çapa Yekem, Çapekanî Renc, 2010.

29.Mihemed Mela Kerîm, Nalî Le Klaw Rojney Şîrekaniywe, Çapa Duyem, Dezgay Aras, Hewlêr –Kurdistan, 2009.

30.Dîwanî Nalî, Mela Ebdulkerîm Muderîs Û Fatîh Eebdulkerîm, Çapa Şeşemîn, Bilawkirawey Kurdistan, 1387Hetawî.

31M. Elî.A, Nalî Her Le Lûtkedaye, Dezgay Çap Û Pexşî Mehwî-Silêmanî, 2009.

**B_KOVAR:**


1.Ebudwla Qeredaxî, Karîgerî Sofîgerî Beser Şîrî Kurdîda, Kovar Ayînde, J.79, Temûz 2008.

2.Fatîme Edhem, Le Îşqî Miroyiyewe Ta Îşqî Îrfanî, Kovar Hejan, J.25, Beharî 2012.

3.Mihemed Silêman Edîb, Mey Û Mestî Le Şîrî Sofîgerîda, Kovarî Raman, J. 17, R.16, Şubatî 2012.

4.Dr. Sebah Berzincî, Peyamî Nalî, Kovarî Koç, J.17- 18, R.276.

5.Ebdul Xalîq Yeqûbî, Kovarî Koç, J.17-18, Nalî Lenîştmaî Meîfiyewe Ta Xurbetî Zman, R.370-371.

6.Mesûd Edhem, Kovar Hejan, J.25, Lewênewe Bo Mana, R.167-168.

7.Mesûd Bînende, Kovara Koç 17-18, Rwanînî Xwar Û Xêç Bo Nalî, R.314.

8.Haşim Serac, Kovar Raman, J.183, Îrotîk Le Şîrî Nalîda, 2012, R.150_153.

9.Mûdrîk Elî Arîf, Îşq Û Îrfan, Kovar Hejan, J.13, R.190.

10.Sewsen Şeryîetî, Paradoksekanî Wîjdanî Aşiqane Leriwangey Şeryîetiywe, Kovar Hejan, J.21, Wergerana: Gulale Elî Mewlûd, R.386.

11.Fatîme Edhem, Kovar Hejan, J.25, Le Îşqî Miroviyewe Ta Îşqî Îrfanî, R.141.

12.Museyîb Edhem Zelimî, Îşq Senter Nebûn, Îşq Berw Senter Çûn, Kovar Hejan, J.21, R.312.

13.Selman Nadîr, Îşq Lenêwan Ftway Fîqhî Û Sîmbolî Îrfanîda, Kovar Hejan, J.13, R.144.

14.Ebdul Kerîm Srûş, Îşq Derencamî Merîfeye, Wergêranî: Şkar Emîr, Kovar Hejan, J.21, R.66.